Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1121 | 29-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Destên bi hev re bahozan radikin!



Anton Smit peykersazekî ji Efrîkaya Başûr e. Ew bi peykerên xwe bi babetên weke lihevkirin, serketin û êşê dadikeve û di vî warî de peykerên wî yên pir bi hêz hene. Çi piçûk û çi jî mezin, peykerên wî di heman demê de hêza xwezayê jî nîşanî xelkê didin. Nexasim jî peykerên wî yên destan ku ji bronzê çêkirine, navdar in. Ev destên ku li pey hev yan jî li ser hev hatine rêzkirin, bi gotina Anton Smit "Bahoz"ekê radikin.

Jixwe, navê van peykerên wî yên ji destan jî "Bahoz" e. Ji bo ku xelekek ava bibe, pêdivî bi gelek destan heye. Ew bi vî peykerê xwe peyamekê dide; di wextê şer de mirov jî pêwîste ku li tiştên xelkê yên hevpar bifikirin, bêhtir li cihêrengiyê difikirin. Anton Smit bi van peykerên xwe yên hîpnotîk, dike ku xelk careke din li ser van meseleyan bisekine û bifikire. Bi van destan nîşan dide ku bêyî hevgirtin û hevpariyê pêşketina xelkê pêk nayê! Ji lewma jî bi peykeran bala xelkê dibe ser têkiliyên insanan ên bi hev re û bi xwezayê re. Ev peykerên Anton Smit, li Cape Town û Pretoria li gelek park û meydanan hatine danîn. Her wiha, ev peykerên wî di gelek pêşangehan de jî hatine nîşandan. Wekî din jî "Parka Anton Smit a Peykeran" jî heye. Ev park jî weke galeriyeke servekirî ye. Di nav parkê de galeriyeke hunerî û her wiha studyoya Anton Smit jî hene.

## Sudoku: Bersiv 32

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 5 | 2 | 7 | 3 | 9 | 1 | 6 | 4 |
| 7 | 3 | 1 | 2 | 6 | 4 | 8 | 9 | 5 |
| 4 | 9 | 6 | 5 | 8 | 1 | 7 | 3 | 2 |
| 6 | 1 | 7 | 9 | 5 | 3 | 4 | 2 | 8 |
| 9 | 8 | 4 | 6 | 2 | 7 | 3 | 5 | 1 |
| 5 | 2 | 3 | 4 | 1 | 8 | 9 | 7 | 6 |
| 1 | 6 | 9 | 8 | 7 | 2 | 5 | 4 | 3 |
| 3 | 4 | 5 | 1 | 9 | 6 | 2 | 8 | 7 |
| 2 | 7 | 8 | 3 | 4 | 5 | 6 | 1 | 9 |

## Sudoku:Pirs 33

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | | | | 9 | | | | |
| 1 | 4 | | | 8 | | | 3 | 5 |
| 5 | | | 1 | | | 6 | 7 | 8 |
| 4 | | | | | | 3 | | |
| | 9 | | | | | | 1 | |
| | | 1 | | | | | | 9 |
| 7 | 8 | 5 | | | 9 | | | 2 |
| 9 | 2 | | | 6 | | | 8 | 3 |
| | | | | 7 | | | | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Min divête te divête melê çi wîtewît e:**
- Em her du (yan jî ew her du) pê razî ne, yên din çima tevlî karê me dibin?

Min rojekê hûn bifirotan û eyb û **arên we bigotan:**
- Ez rojekê derfetê bibînim ezê hesabê her tiştî ji we bixwazim; hûn pir kêmayiyan dikin.

)Dema mirovekî durist tiştekî xwe, heywanekî xwe difiroşe kêmayiyên tiştên xwe tevan dibêje(

**Tu çima xwe didî ber baranê:**
- Tu çima tevlî wî karî dibî?

**Zimanê wî li ser xwe dirêj neke:**
- Tiştên nebaş neke da bi nebaşî behsa te neyê kirin; tiştên nebaş neke da tu neyî rexnekirin.

**LI SER SÛC, SÛCDARÎYÊ Û CEZA**

**Avêt ser:**
- Xist stûyê wî; xwest wî sûcdar derxe.

**Avêt stûyê wî:**
- Xist stûyê wî; ew tawanbar kir; ew sûcdar kir.

**Bi destkêşiya wî (bi destkariya wî) bû:**
- Bi gotina wî wisa bû; destê wî di navê de heye; wî daye kirin.

**Bi destkêşiya wî wisa çêbû:**
- Bi heman wateyê.

**Binê wî şil e:**
- Sûcên wî pir in; ji ber ku gelek xirabî kirine ji xwe ditirse.

)Kesên ku tê texmînkirin tiştin nebaş kiribin, ji bo wan tê gotin(

**Binê wî ter e:**
- Bi heman wateyê.

**Cihê wî ne li erdê heye, ne li ezman:**
- Sûcên pir mezin kirine.

**Cihê agir lê neyê kirin dû jê ranabe:**
- Kesê kêmayiyan neke gotin li ser nayên gotin.

**Cila wî şil e:**
- Sûcên wî pir in.

**Çavê xwe bixe çavê min:**
- Baş li min binêre; berê xwe nede deverin din.

**Da dest:**
- Giliyê wî kir; da girtin; cihê wî eşkere kir.

**Destê wî di navê de heye:**
- Ew jî şirîkê sûc e; haya wî ji bûyerê heye; ew jî di nava bûyerê de ye.

**Dewsên kerê ne, fêlên Perê ne:**
- Çawa ku li ber çavan xuya dike rastî ne wisa ye; rastî bi awayekî din e.

**Dirika xwe bi deste min dernexe:**
- Xirabiya xwe bi min nede paqijkirin; te xirabî kiriye tu dixwazî ez te biparêzim.

**Diz xwediyê malê girt:**
- Yê sûcdar yê ne sûcdar sûcdar kir.

**Diz xwe bi ser xwediyê malê xist:**
- Bi heman wateyê.

**Dîz û kûz di serê wî de şkestin:**
- Haya wî ji tiştekî tinebû lê sûc ket stûyê wî.

**Dîzika xwe di serê wî de şkênandin:**
- Bi heman wateyê

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Gundiyên Feqiyan, ji bo zivistanê dest bi komkirin û amadekirina berheman kirine



Li gel bi dawîbûna werzê havînê û hatina werzê payîzê re gundiyan dest bi komkirina berhemên havînê û amadekariyên ji bo werzê zivistanê dikin. Wek beşek ji gundiyên sînorê Rewandizê dibêjin berhemên xwemalî bikartînin û xwe bi xwarinên hinarde ve girênadin, lê sermaya werzê bihara borî ziyanek mezin da berhemên wan. Bi dawîbûna werzê havînê û hatina werzê payîzê re gundiyên Herêma Kurdistanê dest bi komkirina berhemên havînê û amadekariyên ji bo werzê zivistanê dikin. Gelek berhemên weke danê hêrayî, porpor, bacanên hişkirî, pariyên hêjîran, mewîj, guz û gelek cureyên berhemên xwemalî li ser banê gundiyan ji bo hişkirinê têne rêzkirin. Gundê Feqîyan yek ji gundên herî xweşik ên Dola Akoyan a li bajarokê Rewandizê ye ku bi gelek berhemên xwemalî bi taybet bi tirî, hinar, hirmî û guzên xwe bi nav û denge. Şêniyên gund bi dirêjiya salê bi hilberîna cur be cur berhemên xwemalî ve mijûlin. Bi dawîbûna werzê havînê û destpêka werza payîzê de dest bi komkirina berheman dikin û beşek jê li bazarê difiroşin, beşek din jî ji bo zivistanê ji xwe re radikin.

Weke niştecihên gund bi xwe dibêjin îsal ji ber hatina pêla befrê û baranê ya di dawiya werza bihara borî de, hemû berhemên xwemalî yên herêmê têkçûn, lewma îsal berhem têra wan nake.

Meta Fatim xelka gundê Feqiyane û li navenda bajarokê Rewandizê jiyan dike, havînan bi tena serê xwe diçe gund û bi baxçe ve mijûl dibe. Meta Fatim xema zivistanê dike û berhemên havînê ji bo zivistanê ji kur û keçên xwe re kom û amade dike. Lê îsal hemû berhemên gund tunebûn.

Meta Fatim li ser banê mala xwe bacan û tirî hişk dike û wiha dibêje: "Her sal di vê werzê peyîzê de gundî dest bi komkirina berhemên xwe dikin û ji bo şevên dirêj yên zivistanê xwe amade dikin. Fêkiyên weke hêjîr, xox, hirmî, mewîj, gûz, doşava (dims) tirî, reçela hêjîran, sehka hinaran û gelek berhemên din ên xwemalî û berê xwe nadin tiştên bazarê."

Her wiha meta Fatim di dewamiya axaftina xwe de diyar kir ku îsal tiştekê wê nîne û wiha anî ziman: "Salên borî de me li ser ban berhemên xwe hişk dikir û piştre ji bo werza zivistanê di rakir. Ji ber ku tama berhemên xwemalî gelek xweşe û ji yên bazarê bi tamtirin. Em xwarinên Kurdewarî yên xwe dixwin û berê xwe nadin tiştên hawirde yên li bazarê."

Mam Bapîr jî xelkê gundê Feqiyane û hemû werzên salê li gund dimîne. Kur û keçên wî ji bajar hatine û ji bo kelandina dan alîkariya wî dikin. Weke di demên berê de bi şêwazên Kurdewarî du mencelên mezin datînin û dan di nav de dikelînin. Ji bilî berhemên fêkiyan, berhemên weke genim, savar, birinc û berhemên din jî radikin. Ji ber ku zivistana gund dijware û ji ber barîna berfê jî nikarin biçin bajar. Ji bo vê yekê Mam Bapîr jî savarên xwe kelandine û li ser banê mala xwe ji bo hişkirinê belavkirine da ku di aş de bi hêrin. Dema Mam Bapîr bi karê xwe mijûl dibû em gihiştin cem û bi westana xwe ve ji bo me axivî û wiha got: "Savar yek ji xwarinên Kurdewarî ya herî xweşe. Em her sal ji bo werza zivistanê amade dikin û radikin. Ji ber ku zivistana me dijware û berf rêyên me digire ku nikarin biçin bajar. Ji bo wê hemû pêdiviyên xwe yên ji bo zivistanê kom dikin."

Mam Bapîr her wiha diyar kir ku li gundan şev, bi taybet şevên dirêj ên zivistanê bê şevbuhêrk derbas nabin, ev çandek e Kurdewariye û wiha ji me re qala wan şevan kir: "Gundî di şevên dirêj yên zivistanê de bi berhemên xwe yên xwemalî, şevbuhêrkên taybet lidardixin. Ger hebe mewîj, gûz, sehk û reşelan datînin."

Li gundên Kurdistanê hîna kevneşopiyên civaka Kurdewarî zindîne û têne berdewamkirin. Şevên dirêj ên werzê zivistanê li gel hev derbas dikin, şevbuhêrkan lidardixin, çîrok, serpêhatî û dengbêjiyan dibêjin.



## PKK'ê bi damezrandina xwe bû mizgîniya azadiyê

Salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê pêvajoya afirandine berxwedan û serkeftina mezin e. Di vî warî de PKK moral e, exlaq e û têkoşîneke mezin e. Rastiya PKK'ê rastiya gelan û mirovahiyê ye. Heqîqeta PKK'ê jî heqîqeta jina azad e.**R-4**

## Şîlan Kobanê pêşenga jin û jiyanê ye

Şîlan Kobanê endama Komîteya Navendî ya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) û hevalên wê Zekeriya, Ciwan û Fûad, ku di encama komployeke hevbeş a ajanên rejimên Sûriyê û Tirkiye li bajarê Mûsilê bi awayek hovane hate şehîdxistin.**R-2**




Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1121 | 29-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

## Azadiya Rêber Apo, azadiya tevahî gelên azadîxwaz e



Ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka siyasî ya Gelê Kurd, di 10`ê Cotmehê de Kampaniyeke Cîhanî li Silovîna hat destpêkirin û li hemû welatên cîhanê deng veda. Hevserokê însiyatîfa parêzerên Sûriyê Mihemed Emîn Neîmî, diyar kir ku Rêber Apo vîn û hêviya tevahiya gelên azadixwaz yên cîhanê ye û got, hizir û felsefya Rêber Apo li tevahiya cîhanî belav bûye û bûye xwedî cihekî binirx.**R-6**

# BI DORPÊÇÊ WÊ NIKARIBIN VÎNA GELAN BIŞKÎNIN

**Hikumeta Şamê bi armanca şikandina vîna gelê Efrînê yê li Şehbayê, dorpêçeke giran li ser herêma Şehbayê feriz dike û nahêle ku sotemenî, derman û pêdiviyên jiyanê derbasî herêmê bibe. Di encama dorpêçê de tevahiya kar û xebatên tenduristî, perwerde û xizmetguzariyê hatin rawestandin û ev yek rê li ber karîseteke mirovî vedike. Tevî zehmetiyan jî gel bibiryardariyeke mezin li ber xwe dide û di riya têkoşînê de gavan bi paş ve navêje.R-3**









## Serpêhatiyên jinên kurd li Efrînê



Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ji destpêka dagirkirina Efrînê ve û heta niha li dijî tevahiya gel û bi taybet li dijî jinan kiryarên dijmirovî pêk tîn in. Hin jinên ku di Efrînê de bûn û bûne şahidê kiryarên dagirkeriyê serpêhatiyê jinan vegotin.**R-6**

## Hunermendê bi hunera xwe li hemberî faşîzm û dijminê azadiyê li ber xwe da



23 sal li ser koça dawî ya hunermendê Kurd Ahmed Kaya re derbaz dibe ku hunerê wek çek û şoreşek li dijî faşîzm û dijminên azadiyê hilgirtibû. Ahmed Kaya û hunera wî ewqas bibandor e ku hîna jî nîjadperestên Tirk ji navê wî ditirsin.**R-7**

**PKK`ê keda gel e û jin parêzvana vê kedê ye** — Nehîr Pale — R-2
**Salvegera PKK'ê ya 45'an bersiva mezin bû!** — Dilyar Cizîrî — R-4
**Hêza gel bandora xwe ya li Filistînê nîşan da** — Zekî Bedran — R-5
**Koma Apoçiyan** — Farûk Sakik — R-5
**Medyaya Kurdî çi bi serê wêjeyê kir? .. Çend têbînî** — Kemal Necim — R-7

# ‘PKK`ê vîna jina kurd gihand lûtkeyê’

**Berdevaka Kongra Star Rîhan Logo diyar kir bi avabûna PKK’ê re û bi saya felsefeya jiyana azad ya Rêber Apo, jina kurd li her çar perçeyên Kurdistanê bi israr û berxwedaniyeke mezin hebûn û nasname xwe parast, herwiha ji tevahiya jinên berxwedêr yên cîhanê re bû mînaka têkoşîn û lehngiyê.**

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Bi avabûna PKK`ê re jinan bi israr û berxwedaniyeke mezin cihê xwe di nava Tevgera azadiyê de girt û li ser kaniya heqîqeta hebûn-xwebûnê herike ye. Herwiha jinên kurd li dijî zihniyeta mêrperset û desthilatdarn berxwedan û têkoşîneke behmpa dan meşandin, ji jinên cîhanê re bûn nemûne. Niha jî bi sedan jinên ku ilhama xwe ji jinên Tevgera Azadiyê birine, bi rihê jinên berxwedêr şoreş û serhildanan li her çar perçeyên kurdistanê didin meşandin.

Di derbarê salvegera avabûna Partiya Karkerên Kurdistanê PKK`ê û guhertina ku bi jinan re da avakirin, berdevaka Kongra Star Rîhan Loqo ji rojnama me re axivî.

Rîhan Loqa diyar kir ku jinên Tevgera Azadiyê bûn nimûne ji jinên cîhanê re û wiha got: “Jinên ku di nava Tevgera Azadiyê de cih girtin, bûn nimûne ji tevahiya jinên azadîxwaz re. Roj bi roj tevlîbûna jinan ji Tevgera Azadiyê re zêde bû û jin bûn pêşeng. Niha bi ruhê tekoşîna ku jinan da meşandin, îro roj her kes jinên kurd nimûne dibînin, heger ev tekoşîn di dîrokê de nehatiba kirin, wê tu kesî jinên kurd nasnekiriban. Berxwedana ku têkoşera mezin şehîd Sakîna Cansiz da meşandin, di milê jinê de guhertineke di asta cîhanî de da avakirin. Beriya avabûna PKK’ê, her kesî li jinê kurd wekî jinên nezan, bêhêz û paşketî dinerîn, lê bi avabûna PKK`ê û pêşengtiya jina kurd jê re, guhertinekî mezin hat çêkirin. Îro roj jin pêşengtiya şoreş û serhiladanan li tevahî parçeyê Kurdistanê dike, ev jî encama fikr û têkoşîna Rêber Apo û PKK’ê ya bi salan e.”

**‘Rêber Apo ronahiyek da li ser taritiya jinê’**

Rîhan Loqo girîngiya têkoşîna ku jinên Tevgera Azadiyê dan mişandin nirxand û wiha got: “Bi têkoşîna şêhîd Sakîna Cansiz jinan cihê xwe di nava PKK`ê de girt, bi têkoşîna şehîd Bêrîtan Artêşbûna jin hat avakirin, bi têkoşîna şehîd Zîlan îdyolojiya jin hat avakirin. Herwiha bi têkoşîn û berxwedana jinan asta têkoşîn û rêxistinbûyinê berfireh bû, di asta yekê de bi serkêşiya jinên kurd ku li tevahî Kurdistanê û Rojhilata navîn, jin bû hêzeke mezin. Jin xwedî hêze û vê hêzê roj bi roj di nava civakê de xurtir dike. Rêber Apo dibêje‘Jineke azad wê malbateke azad ava bike, malbatên azad jî wê civakeke azad ava bike’. Di sedsala 21`mîn de şoreşek bi pêşengtiya jinan hat li darxistin, ev yek bi destkeftiyên jinên Tevgera Azadiyê bû. Yê ku ronhiyek da li ser tarîtiya jinê jî Rêber Apo bû, Rêber Apo got wê meşa azadiyê bi pêşengtiya jin were meşandin, êdî jin bû xwedî ewqas destkeftî di nava PKK`ê û giştî cîhanê de.”

**‘Damezrandina PKK`ê roja vejînê ye’**

Rîhan Loqo di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku damezrandina PKK`ê roja vejînê ye û wiha got: “Avabûna PKK`ê roja vejînê ye. Bi 100’ê salan e ku Jin li Kurdistanê û tevahiya Rojhilata Navîn, ji aliyê olperst û zayendperestî ve rastî êrîşên mezin yên li ser nesname, hebûn û destkeftiyên wê, hatiye. Lê jinên Tevgera Azadiyê heta astekê rê li hemberî vê yekê girt. Ji bo ku jin xebat û têkoşînekê bide meşandin hêzek mezin jêre pêwîste û yê ku ev hêz û têkoşîn li cem jinan da avakirin Rêber Apo bû. Bi pêşengtiya jinên kurd jinên Ereb, Tirkmen, Siryan û Çerkez hatin perwerdekirin. Her kesê ku felsefeya Netewa Demokratîk nas kirin hîn bêtir derdora vê rêxistinbûyinê berfirekirin. Bi piradîkma Netewa Demokratîk bi 100’an jin ji tevahî cîhanê hatin rêxistinkiirin bi taybet jinên kurd gavên girîng û bi wate avêtin.”

**Ilhama Şoreşê ji Şehîd Sakîna Cansis dest pê kir**

Rîhan Loqo girîngiya xebatên jin di sedsala 21`an de anî ziman û wiha got: “Di sedasala 21`mîn de, têkoşîna jina kurd ji aliyê şehîd Sakîne Cansiz ve hat destpêkir û xebateke gelekî girîng hat kirin. Niha jî bi hezran jin di nava PKK`ê de cih girtine, bi armanca ku hîn bêtir karibin Tevgera Azadiyê xurt bikin û em weke jin nasname û hebûna xwe biparêzin, bi vê yekê jî ji dîrokê re isbat bikin ku jin xwedî mafin û bibin nimûne ji tevahî jinan re, li ser vê bingehê xebateke pîroz hat meşandin. Tevî ku di demekê de ewqas êrîş li ser Tevgera Azadiyê û jinan dihat kirin û heta niha jî ev êrîş berdewammin, lê berxwedana jinê li hemberî vê yekê zêdetir bi hêz bûye. Bêriya niha her kesî digot jin nikarin di qadên şer de têkoşîn bikin, lê çalakiya şehîd Bêrîtan û berxwedana wê ya bê hempa, hêz û israra jinên berxwedêr da isbatkirin. Îro roj bi rihê şehîd Bêrîtan şehîd Arîn, Hevrîn, Barîn, Zîlan û bi sedan qehremanên di nava YPJ`ê de ku li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bi vîn û hêzeke mezin



di tevahî qadên şer de ji bo parastina axa welatê xwe, têkoşînên mezin dan meşandin. Di heman demê de li Rojhilatê Kurdistan û Îranê jî jinan ilhama xwe ji şoreşa Rojava girtin, îro bi silogana ‘Jin Jiyan Azadî’ li dijî desthiltdaran serhildanê didin meşandin.”

**‘Bi yekîtiya jinan dawî li pilanên dagirkeriyê bînin’**

Berdevaka Kongra Star Rîhan Loqo axaftina xwe wiha qedand: “27`ê Mijdar roja vejînê ye, li Rêberê mirovahiyê mîmarê azadiyê Rêber Apo û li tevahî dilsozên azadiyê, jinên têkoşer û berxwedêr, malbatên welatparêz yên ku bi salan têkoşînekî mezin bê navber berdewam kirine, roja vejînê li wan pîroz dikim, bi taybet vê rojê li qomîtana bihêz şehîd Sakîna Cansiz û tevahî şehîdên meşa azadiya jinê, wan bi bîr tînin û bejna xwe li beramberî wan ditewînin. Herwiha bi vê mûnasebetê her kesê ku niha li qada ne û dilê wan ji bo azdiyê lê dide silav dikin û soza xwe dobare dikin ku em ê bi vê roja ku ji her jinekê re bû ronahiyek hîn zêdetir israra me ji bo azadiyê û avakirina civake demoratîk berxwedana xwe xurt bikin û asta têkoşînê bilind bikin, asta rêxistinbûyinê berfireh bikin û asta zanistê jî li pêş bixin. Bi hev re bi yekîtiya jinan em ê dawî li pilanên dagirkeriyê bînin û tecrîda giran ya li ser Rêberê gelan Rêber Apo, hilweşînin.”

## Ji Pênûsa Jin

### PKK`ê keda gel e û jin parêzvana vê kedê ye

**Nehîr Pale**

Partiya Karkerên Kurdistanê tevgera gelan e. Bi keda gel têdikoşe, keç û xort ji gelek ciyên cîhanê tevlî tevgerê dibin. Jin jî weke pêşeng, fermandar û rêveber ciyê xwe di nava partiyê de digrin û têdikoş in.

Di dîrokê de têkoşîna jin a li hemberî zîhniyeta mêr kevne û Partiya Karkerên Kurdistanê ev têkoşîn bi wate kir û xwedî lê derket. Niha jî jin bûye parêzvana hemû nirxên manewî û madî yên partiya gel.

4000 BZ hişmendiya mêr êrîşî jin kir û dest bikomployan kir. Di civaka xwezayî de jin ji her alî ve berpirsyartiya civakê rakiribû û birêve dibir. Piştî 3500 BZ. bi riya parêstgehan jin anîn asta herî jêr û rola wê ya di civakê de pûç kirin. Jin di pêvajoya Someriyan de, di olên yek xwedayî û kaptalîzmê de kirin koleyê mêr û her ji bo xizmeta mêr dan bi kar anîn. Hişmendiya mêr civak anî rewşa cinsiyetparêziyê û êdî jin ji her alî ve bi qeyd û zincîran girêdan. Jina ku wan dixwest diviyabû nefikire, tiştekî ne pirse, jêre çi bibêjin pêk bîne û çawa nêzî lawiran dibûn wiha nêzî jinê jî dibûn. Li gorî wan a ji jinê dihat xwestin zarokan bîne, şîr bide, xizmeta mêr bike û hemû karê malê li ser pişta wê be. Jin jî ev yek li ser xwe qebûlkiribû û bêdeng mabû. Li hemberî hemû rê û rêbazên bi jinê didan bi kar anîn ew fêrî bêdengiyê kiribûn. Eger di şoreşên cîhanê de ciyê xwe girtibe jî destûr nedidan wê ku bibe pêşeng û şoreşan bi rêve bibe. Zîhniyeta mêr a jin tenê ya xwarinçêkirinê ye, çarenûsa jinê diyar dikir. Jin li hemberî zîhniyeta mêr ketibû, hewl dida ku xwe bi mêr bide qebûlkirin, digriya yan jî xwe dikuşt. Diyardeya canê xwe firotin her berfereh dibû û tenê civakê aliyê exlaqî ve qebûl nedikir. Sîstemên heyî her ji destê wan dihat diyardeya fihûşê zêde dikirin û bibû yek ji çekên li hemberî jin ku didan bi kar anîn. Rêber APO li hemberî hişmendiya mêr û civaka cinsiyetparêz dest bi têkoşînê kir û di avakirina Partiya Karkerên Kurdistanê de rolekî mezin da jinê. Ew jina ku hatibû perçiqandin û fêrî koletiyê kiribûn aliyê siyasî, leşkerî, dîplomasî, aborî û hwd, dest bi têkoşînê kir. Li zîndana Amedê şehîd Sakîne Cansiz li hemberî derbeya leşkerî ya dewleta Tirk a dagirker serî netewand û têkoşîn kir, keçika Dêrsimê Bêrîtan jî li dijî xiyanetkar û dagirkeriya Tirkiyê li ber xwe da û radest nebû, herwiha şehîd Zeyneb Kinacî sala 1996`an bi rêbazekî ku her kes matmayî ma, li dijî komploya li ser Rêber APO bû xwedî helwest û çalakiya fedaî kir. Helwesta şehîd Zeyneb Kinacî ji hemû jinan re bû exlaq û rêgezên têkoşînê. Li hemberî çeteyên DAIŞ`ê û êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jin xwedî helwestekî xurt bû. Tevgera jin êdî fereh bûye û doza wê cîhanî bûye. Berpirsyartiya parastina nirxên madî û manewî yên civakê rakiriye û di civakê de bûye xwediyê rolekî mezin.

# Şîlan Kobanê pêşenga jin û jiyanê ye

**Deriya Çiya/ Qamişlo**

**Şîlan Kobanê endama Komîteya Navendî ya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) û hevalên wê Zekeriya, Ciwan û Fûad, ku di encama komployeke hevbeş a ajanên rejimên Sûriyê û Tirkiye li bajarê Mûsilê bi awayek hovane hate şehîdxistin.**

19 sal li ser şehadeta damezrînerên Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê Şîlan Kobanê û hevrêyên wê re derbas bûn. Têkoşîna ku wê dayî, li Bakur û Rojhilatê Suriyê belav bû li tevahî cîhanê deng veda.




**Şehîd Şîlan Kobanê kî ye?**

Çîroka têkoşîn û berxwedanê ya Şîlan çîrokeke bêhempa ye. Şîlan di 9 saliyê de dest bi têkoşîna azadiya Kurd û jinê kir, şerê hişmendiya desthilatdar kir û hewl da fikirê azadiya Kurdistan di nava gelê Kurd de belav bike. “Şîlan keça biçûk, xwediyê por zêrîn, mejiya wê ji temenê wê mezintir bû, çavên wê bi hêviyê dibiriqîn.”

Têkoşer Meysa Baqî (Şîlan Kobanê) sala 1971’ê li gundê Kor Elî yê 25 kîlometre dikeve rojavayê bajarê Kobanê ji dayik bû. Di nava hawîrdoreke ku urf û adatên eşîrtî lê serwer de mezin bû. Malbata wê ji dayik, bav, 5 keç û 4 xortan pêk tê û di dawiya salên 1970’î de ji bo kar berê xwe dane Helebê.

Şîlan di 9 saliyê de, di sala 1980’î de, Tevgera Azadiya Kurdistanê nas dike, bi kesayeta rêber Abdullah Ocalan û fikirê wî ve tê girêdan û hêvî dike ku bibe têkoşerek.

**Rêya azadiyê**

Têkoşer Meysa Baqî (Şîlan Kobanê) xwendina xwe ya qonaxa navîn temam dike û di Tebaxa 1988’an de li Helebê tev li têkoşîna Tevgera Azadiya Kurdistanê dibe û tevî 4 hevalên keç berê xwe didin Lubnanê, li dergehê sînor ê sûrî-lubnanî ji hêla desthilatên Lubnanê ve tên sekinandin. Du mehan di girtîgeha jinan de dimîne û li wir jiyana civakî nas dike. Dûvre şehîd Şîlan Kobanê tevlî Akademiya Şehîd Mahsûm Korkmaz a li Lubnanê dibe, li wir perwerdeyên leşkerî û siyasî dibîne û têkoşîna xwe bi navê “Seadat” dest pê dike û piştre navê Şîlan li xwe dike.

Tevî israra şehîd Şîlan a çûna qadên şer ku li gel hevalên xwe şer bike, lê piştî perwerdeyê ji bo çalakiyên rêxistinî li Lubnanê tê erkdarkirin. Her wiha piştî şopandina xebatên rêxistinî li Lubnanê, careke din di 1989’an de vedigere Akademiya Şehîd Mahsûm Korkmaz.

**Şîlan Kobanê pêşenga azadiyê ye**

1982’an, dema şîlan di 11 saliya xwe de bû, dema rêber Abdullah Ocalan sedana mala wan dike, ew cara yekemîn e wî dibîne û nas dike.

Şîlan derbarê wê vê rojê de wiha gotibû: “Ew kêliya herî bi wate ya di jiyana min de bû. Piştî wê rojê min fêm kir ku wê êdî jiyana min weke berê dewam neke. Ez evîndarê Kurdistan û azadiyê bibim û ez ê peyde biçûma”

Şîlan li Akademiyê di Radyoyê de û di beşa Erebî de dixebite.

Di konferansa 1991’an a li çiyayên Kurdistanê, ew derbasî qada çapemeniyê bû.

Ji ber vê Şîlan li rex amedekirina kovaran weke nûçegîhaneke şer jî xebitî.

Piştre, di Konferansa Yekîtiya Azadiya Jinên Kurdistanê ya 1995’an de, Şîlanê weke Endama Komîteya Navendî ya YAJK’ê hat hilbijartin. Di şertên herî zehmet de, bi sekna xwe ya rast, bû çavkaniya hêz û moralê ya hevalên xwe.

Di sala 1997’an de Şîlan derbasî bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê dibe û dest bi xebatên rêxistinî dike. 1999’an de jî Şîlanê cihê xwe di rêveberiya Partiya Azadiya Jinên Kurdistanê de digire. Bi lidarxistina kongreya PYD’ê ya 2003`yan re wek Endama desteya rêveber a partiyê hate hilbijartin. Piştre berê xwe da Rojava da ku beşdarî çalakiyên rêxistinî bibe. Dema ku têkoşer Şîlan kar û xebatên di navbera Iraq û Sûriyê dikir, 29’ê Mijdara 2004’an di encama kemîneke hevbeş a Rêjîma BAAS’ê û dewleta tirk de bi hevalên xwe Zekeriya, Ciwan, Fûad û Cemîl li bajarê Mûsilê hat armanckirin û şehîdxistin. Lê bi şehîdxistina Şîlanê re jî nekarin pêşiya şoreşa Rojava bigrin.

Şîlan Kobanî ne tenê ji bo xwe, ji bo tevahî jinan mîras û hêviyeke şoreşê li pey xwe hişt û bedela wê jî li ser navê hemû jinan da. Ji lewra ger şoreşa Rojava îro li tevahî cîhanê gav bi gav deng vedide û dibe navê hêviyan, ji ber di havênê wê de Şîlan Kobanê heye. Li Rojava “firîşteyên welatê bihûştê” bi navê Şîlan li pey eşqa azadiyê berxwedan didome û wê bidome.



# ŞIVERÊ...

**Cîger Dilşad**

Piştî sî salên zîndana dewleta Tirk ya faşist giham axa azad. Pêşîya pêşîn min soza ku di zîndanê de dabû xwe bi cih anî; axa pîroz maç kir.

Qandîl qiblegeha Kurdên azad e.

Qandîl çavkanîya rihê azad e!

Qandîl warê ku mirov lê dikare ji hemû qirêjîyên pergala Moderniteya Kapîtalîst xelas bibe û bi çavên jindayîkê li dinyayê binêre, xwe ji hemû nexweşîyên pergala baviksalarî rizgar bike û gîyana xwe azad bike ye!

Çimkî Qandîl îro hêlîna ku felsefa Rêber APO lê tê jîyankirin e û ji wir li çar alêyên Kurdistan’ê û cîhanê belav dibe ye!

Di civaka Qandîlê de ji xeynî felsefeke azad, rihekî azad û daxwaza azadîya civakî ku bi azadbûna jinê re misoger dibe tiştekî din tune ye!..

Erê, ez wekî zarokekî bi kincên cejê şadibe, belkî jî mîna feqîrekî birçî tenê salê carekê roja cejnê piçek goşt bi dest dikeve û kêfxweş dibe, dibe ku şahîya min manendî ya evîndarekî ku demeke dirêj evîndara xwe nedîtî û dibîne bû.Ya rast tam naşibihe yeke ji wan jî, belkî şahîya min berhevkirina hemûyan bi hev re bû.

Piştî 30 salên zîndanê min axa welat bi coşeke ku nikarim pênase bikim hembêz û maç kir!

Lê,nikarim bêjim ku bi tevahîya hebûna xwe ez bi delala xwe şabûm. Nikarim bêjim ku şahîyeke têr û tijî jîyam.

Derketinê derketibûm û gihabûm dilê xeyala xwe. Lê li pey min bi hevalên ku me bi hev re temenek derbas kirî mabûn. Û ya herî girîng jî hêj Rêber APO DI BIN TECRÎD Û DI NAVA PERGALA QIRKIRINÊ DE TÊ GIRTIN! Lewra baskên şahîya min şikestî bûn!

Berêya çend rojan bi hevalekî ku porê xwe di şiverêyên van çîyayên rûmetdar de spî kirine re dimeş îm. Çend caran sekin îm û min li paş xwe, li şiverêya ku tê re derbas dibûn nêrî. Bi xeyala wan hevalên ku di vê şiverê re berîya salan derbas bûne ponij îm. Min ji xwe re got;” gelo çend ji wan hevalan şehîd ketine,çend mane, çend gazî bûne û çendan îxanet li xeyalên xwe kirin û çûne îxanetê?”

Bê bersiv bûn pirsên min. Bawer dikim ku tu hevalek jî bersiva wan pirsan tam nizane. Ji dehê salan ve ye ku gerîlayên azadîyê li van çîyan hêlîna xwe çêkirine û ji wê rojê de bi hezaran. Belkî jî tu kesî hêjmara yên hatine û çûne jî nizane.

Ji xwe pirsên bê bersiv bi xwe re pirsê din jî tîne;”gelo hevalên mane niha li ku ne û çi dikin, bi çi karî re mijûl in? Gelo wan li ser hevalên ku li cem wan gihane şehadetê nivisîn e?”

Ji şiverêyan, ji qantara çîyan, ji newalên kûr, ji qiraxa çeman û ji pêsîra çîyan hema ji herderê bêhna kulîlkên ku bi xwîna şehîdan hatine avdan difûrî.



Ya rast Kurdistan’ek di bin axa welatê me de hatibû avakirin! Ji lewra her bihostek vê axê pîroz û rûmetdar e! Ji lewra gava dimeşîm hinekî baldar dimeşîm. Min di pelên daran de,di xumxuma avê de, di rûyê lat, zinaran de,di koka dara mazî de, kozikên ku hevalan di salên cuda cuda de li vir çêkirine de rûyê wan hevalan didît! Ji her derê dengê kenê dilê wan dihat û li perdeya guhê dilê min diket,dilê min bi zîzîyeke heta wê kêlîyê qet nejîyabûm,dihejî.

Kenê wan canhevalan diteyîsî ronahîya çavên min û hawîrdora min ronî dikir. Dengê kenê wan ji guhên mêjîyê min re lorîn bûn û aramîyeke gîyanî diafirand, ku mirov pê dikare temenekî têbikoşe û bi serkeftî bijî!

Dengê kenê wan ji gîyana min re awaza meşa ber bi serkeftinê bû !

Min ji wan şiverêyan bîranîna wan canhevalan, yên ku her yek carekê jîybûn, biriqand hişê xwe! Min laşê evînên nîvço hatibûn hiştin berhev kir! Min êşên ku wan jîyabû tevî coşa dilê wan berhev kir û ew kirin gurzek û da ber pozê gîyana xwe! Min hêvîya ku ji çavên wan firîyabû û îro wekî pêmpilokan azad li ser her darekê, gîyayekî û di ezmanê welatê min de baskan li hev dixin, li ser perdeya dilê xwe bi nîva evîna wan ya maye nexş kir!

Min ji bin lat û zinaran, ji ber koka dara mazî, berû û kiwîzanan kelecana wan ya şoreşê li ser kevçikê dilî bi cih kir. Gava tavê wekî her roj xatirê xwe dixwest, min serê xwe ber bi ezman ve zivirand û çeysandina heyvê li stêrkan nêrî. Çûrisandina wan jî pir cuda ji min re hat.


Rûyê stêrkan li ken bû. Geşbûna stêrkan dilê min jî geştir kir.

Em li ser latekê rûniştin. Min li rûyê hevalê por spî nêrî. Nizanim ka ji ber çi bû, lê rûyê wî jî li ken bû. Belkî ji ber heman egerê bû, belkî jî ji sebebek din bû kenê wî. Lê ya rast kenê wî li xweşîya min çû. Min di dilê xwe de got;” ken herî pir li şoreşgeran û dayikan tê!”

# Hunermendê bi hunera xwe li hemberî faşîzm û dijminê azadiyê li ber xwe da

**23 sal li ser koça dawî ya hunermendê Kurd Ahmed Kaya re derbaz dibe ku hunerê wek çek û şoreşek li dijî faşîzm û dijminên azadiyê hilgirtibû. Ahmed Kaya û hunera wî ewqas bibandor e ku hîna jî nîjadperestên Tirk ji navê wî ditirsin.**

Qasî şerê bi çekê, di her serdemekê de cihê hunerê jî di şoreşên gelan de cihek taybet û giring giritiye. Bi taybet çanda bi hev re têkoşîna şerê çekdarî û hunerî ya gelê Kurd xwedî kevneşopiyek kevnare. Ahmed Kaya jî yek ji wan hunermendan bû ku huner, saz û dengê xwe li dijî faşîzm û dijminan wek çekek hilgirtibû û têkoşîn dikir. Huner û siyasetê ji bo xizmeta gelê xwe li hev kir û rondikên dayikên xwe bi gotinan anî ziman. Her çend jiyanê tenê yek derfet da wî ku stranekê bi zimanê dayikê tomar bike, lê stranên wî her tim daxwaza wî ya kûr a azadiya gelê xwe û jiyana hevbeş diyar dikirin.



Hunermendê Kurd ê mezin Ahmed Kaya di sala 1957’an de li bajarê Meletiyê jidayîkbûye. Bavê wî ji netewa Kurd û dayîka wî jî Tirke. Bavê wî bi eslê xwe ji Semsûrê bû û ji bo kar peyda bike koçî Meletiyê kiriye. Dema Ahmed Kaya jidayîbûyî, bavê wî di kargehek ya dewletê de dixebitî. Dayîk, bav û her 5 zarokên malê di xaniyek biçûk ya kargehê de jiyan dikirin.

Dema bavê wî sazek ji Ahmed Kaya re dikire, di temenê 6 salî de xwe fêrî lêdana sazê dike û gava xwe ya destpêkê ji bo qada mûzîkê davêje. Di temenê 9 salî de dest bi stranbêjiyê dike û di şeva Cejna Karkeran de stran ji bo karkeran dibêje. Di salên 70’î de ji ber rewşa xirab ya debara jiyanê û zextên li ser Kurdbûnê, malbata Ahmed Kaya neçar dibe ji Bakurê Kurdistanê koçî Stenbolê bibin. Ji beriya ku bibe stranbêj, ji bo debara malbata xwe dabîn bike demekê wek şofêrê taksiyê kar dike, her wiha li gel dostekê xwe yê bi navê Beşar Abî karê şofêriya otobusê kiriye.

Kaya ji zarokatiya xwe ve xwedî ruhekî serhildêr bû, di 16 saliya xwe de ji ber çapkirina afîş û pankartan hat girtin. Li gel hevalên xwe li Klûba Zanistê ya Gel muzîkê lêdixist û stran digot ku vê yekê ruhê wî yê serhildêr hîn zêdetir pêş dixist. Vê yekê jî di piraniya albûm û stranên ku li pey xwe hêlayî de derket holê.

Ahmed Kaya di hewldana xwe ya yekem a ji bo derketina ser dîkê de, piştî konserekê diçe cem stranbêjê navûdeng Ruhî Su, çû zanîngeha Boğaz Îçî û ji Ruhî Su xwest ku guhdariya lêxistina wî bike. Piştî stranbêj Ruhî Su vê daxwaza wî qebûl kir, di nîva lêxistina wî de saza wê ji destê wî girt û jê re got: “Nabe ku wek li hespê siwarbûyî li sazê bixî, divê bi nermî lêbidî.” Lê Ahmed Kaya li ser şêwazê xwe israr kir.

Di sala 1985’an de albûma xwe ya yekem bi navê ‘Negrî Pitika min’ derxist. Lê albuma Ahmed Kaya di demeke kurt de rastî nefreta rayedarên Tirk hat û hat qedexekirin.

Di 10’ê Sibata sala 1999’an de dema Xelata Baştirîn Stranbêjê Salê wergirt ji Cemiyeta Rojnamegerên Çapi Tabloyê xelat girt, di axaftina xwe de wiha tîne ziman: “Min stranek Kurdî di nava albûma xwe ya nû de daniye, ji ber ku ez bi eslê xwe Kurdim. Gumanê min nîne ku wê dezgehên bi wêrek hebin ku albûma min biweşînin.”Piştî gotinên xwe xilas kir gelek stranbêjên Kurd êrişî Ahmed Kaya kirin û heqaret lê kirin.

Di 30’ê Sibata sala 1999’an de, Dadgeha Asayîşa Nîştîmaniya Tirkiyeyê tometa xiyanetê xist ser Ahmed Kaya û li hemû derê Tirkiyeyê, Tirkên nîjadperest êrişî Ahmed Kaya kirin. Di vê demê de berê xwe dide Ewrupayê û Dadgeha Asayîşa Nîştîmaniya Tirkiyeyê bê amadebûna Ahmed Kaya 12 sal cezayê girtîgehê dide wî.

Di sala 2000’an de bi awayekî giştî li Fransayê niştecih dibe. Lê sirgûnê nekarî birînên wî derman bike û di hevpeyvînek xwe de bi çavên tijî rondik wiha qala xerîbiya welat dike: “Havîn be zivistan be, şevan gelek sar dibim, ne ji ber ku hewa germe yan jî sare, yek sedem heye ew jî ji ber dûrbûna ji welat e.”

Di sala 2000’an de li Fransayê konserek mezin lidarxist ku nêzîkî milyonek kes beşdar bûn û di vê konserê de bi cara yekem strana bi navê ‘Em Kurdin heta mirinê’ got.

Ahmed Kaya li surgunê û di xerîbiya welat de, di 16’ê Mijdara sala 2000’an de li Fransayê koça dawî kir û li rexa Sînemagerê Kurd Yilmaz Guney spartin axê. Ahmed Kaya û hunera wî ewqas bibandor e ku hîna jî nîjadperestên Tirk ji navê wî ditirsin, ji ber wê jî di 20. salvegera wefata wî de gora wî ya li Parîsê ji aliyê kesên nenas ve hat xerakirin. Di jiyana xwe giştî de 17 albûm derxist.

## Têbînî

### Medyaya Kurdî çi bi serê wêjeyê kir? .. Çend têbînî



**Kemal Necim**

Wêje û ragihandin her çiqas du qadên cuda ne, lê her wiha têkelin û pêdiviya her qadekê ji wan bi ya din heye. Berhema wêjeyî bi rêya ragihandinê dikare bête danasîn û belav kirin, herwiha wêjevan jî bi rêya ragihandinê bi civakê têne danasîn. Bermaberî wê jî berhema medyayî hewceyî naveroka wêjeyî ye da ku bedewtir û hêsantir bighêje civakê. Tê zanîn ku li cîhanê hin berhemên wêjeyî berî ku bibin pirtûk bi rêya rojnameyan hatin belavkirin, her wiha pir wêjevan berî ku berhemên wan bibin pirtûk bi rêya medyayê hatine nasîn. Mînaka wê jî Maxim Gorky li Rûsyayê û Honorê de Balzac li Fransayê ku romanên wan berî bibin pirtûk weke rêzenivîs di rojnameyan de hatine weşandin.

Piştî pêşketin û guhertin û pirbûna şêwe û alavên ragihandinê yên nivîsî, dîtbarî û dengbarî, êdî ev rola girîng ya ragihandinê ya danasîn û belavkirin û belgekirina berhemên wêjeyî her mezintir dibe. Lê çawa ku ragihandin dikare qada wêjeyê û berhemên wêjeyî û wêjevanên afrêner bilind bike, ew qasî dikare bibe sedema tevlihevî û şêlobûn û reşbûna vê qadê. Ji bo ku ev tişt hemû çê nebin, berpirsyarî û rêzgirtin pêwîst e, ango pêwîste ku qada medyayê rêzê bide rêgez û pirensîbên xwe, herwiha rêzê bide wêjeyê jî û hay ji berpirsyariyên xwe hebe. Ger wilo nebe dê rewşên xerab rû bidin, weke rewşa ku niha li herêma me heye.

Li rojava piştî salên dirêj ên qedexe û çewisandinê defeteke azadidyê vebû û êdî wêjevan dikarin bi azadî nêrîn û ramanên xwe derbirînin û berhemên xwe yên wêjeyî çap û belav bikin. Herwiha bi dehan dezgehên medyayê jî hatin avakirin ku ew jî ji bo wêjevanan bûne pencereyên derbirîn û danasînê. Lê mixabin ku ev qada ragihandinê guh neda rêgezên xwe û bi rêz û berpirsyarî tevnegeriya û naveroka wêjeyê bi zanebûn û hûrgilî ne hilbijart û tiştên buha û arzan tevlîhev kir û di heman selikê de firot.

Sedemeke sereke ya vê rûdanê ku xebatkar, karmend û bernamegerên qada medyayê ne kesên pispor û rewşenbîr in ku karibin buha û arzaniya berhema wêjeyî ji hev veqetînin, lewma li şûna çawaniya naveokê, li tijîkirina naverokê geriyan.

Sedemeke din jî ew e ku qada erdnîgarî û civakî ya Rojava pir teng û hindik e, li ser vê erdnîgariya hindik bi dehan alav û dezgehên medyayê hene (TV, Radiyê, Rojname, Kovar û Medyaya Civakî), hin ji van dezgehan ên xwecihî ne hin jî navend û şaxên dezgehên derve ne. Ev Hemû dezgeh jî bernameyên wan ên heftane û mehane yên wêjeyî û çandî hene, ji xwe şêweyê hêsan ê amadekirina bernameyekê ew e ku tu kesekî bîne studioyê û bi qasî saetekê pêre hevpeyvînê bike. Lê weke me got, dezgeh pir in, bername pir in û naverok kêm e, lewma amadekarên bernameyan dê ji xwe re li naverokekê bigerin, di lêgerînê de jî haya wan ji berpirsyariya wan tune ye, haya wan jê tune ku nabe tu her kesî weke wêjevan bi civakê bide nasîn, lewma heme kî du rêz nivîsîbin jêre dibêjin tu nivîskar e, ka bi xêra xwe were em hevpeyvînekî bi te re çêbikin. Wiha hew me dît ku li vî welatî êdî qada wêjeyê şêlo û tevlihev bû.

Bi kurtasî, medyaya Kurdî pêwîste derbarê naveroka wêjeyî de bi berpirsyarî û rêzdarî tevbigere.

# Serpêhatiyên jinên kurd li Efrînê

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ji destpêka dagirkirina Efrînê ve û heta niha li dijî tevahiya gel û bi taybet li dijî jinan kiryarên dijmirovî pêk tîn in. Hin jinên ku di Efrînê de bûn û bûne şahidê kiryarên dagirkeriyê serpêhatiyê jinan vegotin.

**Zana Roj/ Şehba**

Tundiya li ser jinê ku bi sedê salan e dewam dike bûye gerdûnî. Li çar aliyên aliyên cîhanê jin tê kuştin, revandin, tecawizkirin û işkencekirin. Di roja îro de jin li gelek welatên rojhilata navîn nikarin di civaka xwe de mafên xwe bi lêv bikin. Mînaka wê jî rewşa jinan li Rojhilatê Kurdistan û Îran, Bakistan, fxanistanê û gelek welatên din jî li ber çavan e. Di civaka Îslamî de di bin kevneşopî û qalibên paşverû de jin nikare bi tena xwe seriyê xwe jî ji male derxe. Li Ewropayê jî jin bûye weke amûreke bikaranîna berjewendî û armancên hişmendiya serweran. Derveyî wê di her kêliyê de jin li seranserî cîhanî rastî tundiya fîzîkî û pîskeolojîk tê ku dibe sedema xwekuştinê. Di nava van qeyran û kirîzan de cîhan li beramberî van sûcan bê denge. Di heman çarçoveyê de devera herî zêde ku li dijî jinan kirayarên dijmirovî tên kirin, Efrîna dagirkirî ye. Li Efrînê û tevahiya herêmên dagirkirî, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê rojane jinan direvînin, dikujin û tecawiz dikin. Ev kiryar jî tev li pêş çavê cîhanê tên kirin, lê cîhan jî wekeî her car bêdeng e. Derbarê kiryarên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li dijî jinan, sê jinên ku li Efrînê bûn û bûne şahidên sûcên li dijî jinan ji rojnameya me re axivîn.

**Vegera hemwelatiyan ji Efrînê re xapandina herî mezine**

Jina Efrînî (S. B) da zanîn ku piştî dagirkirina Efrînê, ew û malbata xwe bi gelê Efrînê re berê xwe dan herêma Şehbayê û li wir bi cih bûn, lê ew hatin xapandin û careke din berê xwe dan Efrînê û wiha anî ziman: "Piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê dagirkiriya Tirkiyê ve. Em bi gelê xwe re derbasî herêma Şehbayê bûn. Her wiha em li bajarokê Til Rifetê bi cih bûn. Bê guman me bi cîran û mirovên me yên li wir mane re dixavîn, piştî demekê em îqna kirin ku em vegerin gund, mal û milkê xwe. Li ser wê esasê em teşwîq bûn û em vegeriyan Efrînê. Lê piştî em derbasî Efrînê bûn me naskir ku em hatine xapandin. Piştî em vegeriyan çeteyan qebûl nekirin ku mal û erdên me yên ku desteser kirine, li me vegerînin."

**Kiryarên dagirkeriyê derheqê jinên Kurd de**

(S. B) di dewamiya axaftina xwe de bal kişand ser tundî û destdirêjiya ku li ser jinan tê kirin û wiha pê de çû: "Di bajarê Efrînê de hemû cureyên destdirêjiyê di derheqê jinê de tê kirin. Rojek derbas nabe







bêyî ku sûcek neyê kirin. Rojane jinên Kurd tên revandin, kuştin, zewaca temen biçûk, zewaca bi darê zorê, destdirêjî û hwd. Dema ez li wir bûm, keçek bi navê (Valentîne) ku zewaca bi ceteyekî re red kiribû, ji aliyê çeteyan ve hemû malbata wê hat tehdîd kirin yan wê pê re bizewice yan jî wê were kuştin. Her wiha bûyerek din li gundewarên derdor me hat qewmandin, çeteyekî destdirêjî li zarokekê 13 salî kir."

**Çîroka jina Efrînî yê ku ji dujehê xilas bûye**

Jina Efrînî (M. Î) ya ji gundê çaqmaqa yê girêdayî navçeya Reco ye ku beriya çend mehan ji Efrînê derketiye wiha behsa serpêhatiyên xwe yên de kir: "Dema ez li Efrînê bûm , ez du caran ji aliyê çeteyên Sultan Murad ve hatim girtin û bi hinceta ku min gotibû çekeke hevjînê min heye, ez bi seatan di lêpirsînê re derbas bûm. "

(M. Î) diyar kir ku hevjînê wê jî di nava çeteyan de bû û wiha domand: "Hevjînê min tevlî komên çeteyan bû û bi jineke ji malbatên çeteyan re zewicî. Ew zilam ji wan çeteyan ne baştire. Her roj ez lêdan dikirim û weke esîrekî nêz min dibû. Bi rastî her roj ji bo min weke kabûsekê bû û bi çend gotinan ez nikarim rastiya ku min jiyan kirî îfade bikim. Her wiha min du zarokên xwe li pey xwe hîştin, ji ber bavê wan nehîşt ez bi xwe re bînim. Raste ez ji wê dujehê xilas bûm lê her du zarokên min û bi hezaran jinên Kurd di wê qirkirinê û dujehê de jiyan dikin."

**'Çarenûsa jinên di Efrînê de ne diyar e'**

Di heman çarçûveyê de jina bi navê (F. M) ku dayîka 3 keçikan û 2 xurta û niha li kampa Serdem jiyan dike, serpêhatiya xwe wiha anî ziman: "Çeteyan di destpêkê de zarokên lawê meta min girtin, piştira keça min ya biçûk girtin û di hemû cureyên îşkencê re derbas kirin. Her wiha keça min ya mezin 2 caran hate girtin. Ez û lawê xwe jî 2 caran hatin girtin û bi hinceta lêpirsînê em 8 saetan di îşkencê re derbas kirin. Dema ku keça min hatiye girtin jineke din pê re birin lê ji ber lêdanê û îşkenceyê wê jinê jiyana xwe ji dest da. Heyanî vê kêliyê tu agahî derbarê keça min de nînin û çarenûsa wê ne diyar e. Li gorî agahiyên ku hatine ji me re keça min niha di zîndana (Maratê) de ye û ji bo serbestberdana wê baceyek pir mezin ji pereyan dixwazin."

Serpêhatiyên jinan li Efrîn û tevahiya herêmên dagirkirî pir zêde ne, tenê ev çend çîrokên ku me karî ji devên jinên ku şahidên kiryarên dagirkeriyê bûn û derbasî herêma Şehbayê bûne, bigrin.

Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn- Sûriye ji destpêka dagirkirina herêma Efrînê ve, zêdetirî 1000 jin hatine revandin. Herwiha zêdetirî 100 jin hatine kuştin û ji wan 10 bûyerên xwekuştinê ne. Li heman çavkaniyê çeteyan destdirêjî li ser 74 jinan kirin e û 1000 jin jî birîndar bûne.

# Nêrînek li ser Jineolojî

**Rustem Jiyan**

**Beşa yekem:**

Di dîrokê de gelek tevgerên jinan ji bo mafê exlaqî derketin ser dikeya dîrokê, lê ji ber ku ne xwedî alternatîfa çareseriyê bûn têk çûn ango bi demê re nekarîbûn bigihêjin armancên xwe yên bingihîn. Bêguman eger em li gera dîrokê binêrin heya roja îro sîstema moderin a kapîtalîst xwe di dereke lê ranekşandibe de nîn e. Lewra gelek tevger jî xwestine ku ji sîstema kevneşop bi rola alternatîf rabin lê di avabûna sîstema xwe de nekarîna gav bavêjin, tê dîtin ku bi demê re ew tevger jî ketine di bin venêrîna sîstema kevneşop, ya ku em bi "Modernîteya kapîtalîst"re vedikin . Wek tê zanîn tevgerek bi navê femîn-îzm ê xwe li sîstema kapîtal-îzm ê rakişand lê wek me li jor jî aniye ziman, ji ber ku ne xwedî pirojeyên çareseriyê bûn bi ser neket.

Di sala 1748'an de, bi pêşengiya Olympe de Gouges ku wek feylesofekî tê nasîn û qebûl kirin, jinên firansayê xwe rêxistin dikirin, lê ji ber ku daxwazên jinan li dijî pergala damezrîner bûn, Olympe de Gouges ji aliyê Dewleta Firansayê ve tê darve kirin, yanî dikare bê gotin di siya dîrokê de gelek geşedanên bi vî awayê çêbûne. Her kesê/a ku xwestine di asteke mezin




de refaransan bi pêş bixin, bi gelek rêbazên cihêwaz hatine tinekirin, heya dikare were gotin bigiranî û bitojahiya şûr, serê wan hatine birîn. Bêguman nimûneyên bi vî awayî di dîroka ku em jêre bi rola şahidiyê ve radibin hene. Li vir di tekoşîna sedê salan de mirovan li ser vê pergalê nîqaş bi pêş de birine, nimûne û wekî pirs jî dikare wer e fikrîn: Raste di wan serdeman de nîqaşên jin çiye? Dihatin meşandin û jin wek tiştekî ku pêwîst e li malê de zarokan xwedî bikin û tiştên ku ji wan re tên gotin bikin besî wan e, yanî ji metayekî wêdetir ne tiştekî dine. Lê di firansayê de ev zêhniyeta ku ji hêla zilamsalarî "Piyawsalarî" ve hatibûn diyar kirin, ji aliyê Jinan ve hate red kirin û dikare bê gotin ku li hemberî wê tekoşînek bi qasî ku mirov nikaribe xeyala wê jî bike hate meşandin, û ev serdema tekoşîna ku em behs jî dikin, bi derketina şahristaniyên dewletdar ve heye û hîna jî dewam dike. Lê dema ku em dibînin li Ewrupayê qaşo ronesansê çêbûye, lê di encamê de ango di wê ronesansê de jî Edaletek nehatiye diyar kirin. Li Ewrupayê gelek serdemên ku mirov ji wan re dibêjin şoreş derbas bûn, lê yek ji wan jî fikrekî ku bikaribe jinê jî di nava xwe de bihewîne pêş neketiye, ji ber wê jî Serokatî dibêje; şoreşa ku jinê bi xwe re Azad neke, ew ne şoreşe.

Bêguman ji bona sîstema damezrîner bi awayekî rast were famkirin, pêwîst e di serî de em li ser kesayetê pêşî bibin xwedî analîzeke ku cihê xwe bigre. Divê em carekî din diyar bikin ku ji bo têkiliyên baviksalarî hêz bi dest bixe û mirov nikare bi çavekî nîçîriyê lê binêre. Mirov nikare wekî pîwîstiya derketineke zagonî ya zelal bigire dest. Ji ber ku zilam xwe li ser rasteqîna hêza zêde, kiriye berdevkê civakê û wisa kariya li ser civak û jin, serwer bike. Ji bo vê yekê pîwîst e em vê mijarê ji pêvajoya herî nêz ve reva bikin û diyar bikin ku zilam di ancama hêza xwe ya fîzîkî û di navê de fêlbazî, kariye xwe wekî kesê îstîsmarker bênase bike.

Li ser vî bingehî Jin wekî zayindek, wekî mirovekî ji civaka xwazayî ye, dikare were fikirîn, lê bi demê re hêza xwe ya bingehîn ji dest dide û dibe mirova herî kêm a civakê, ku mehkûmî koledariyekî herî berfireh tê kirin. Bê guman hemû koledariyên din jî bi koledariya jinê ve girêdayî pêşdikeve. Lewma ger koledariya li ser şexsê Jinê ve neyê dahurandin, koledariyên din jî nayên dahurandin. Yanî mirov dikare diyar bike ku heger koletiya li ser jin neyê derbas kirin, wê koletiyên din jî neyên derbas kirin. Ji lewra pêwîste em berê pêşî pergala koletiya ku li ser Jin hatiye ferzkirin bi awayekî rast fam û şîrove bikin. Ji ber rêzenivîsa me li ser "DANASÎNEK LI SER JINEOLOJÎ" ye, nabe ku em qala helwesa xwe ya di derbarê zilam de nekin. Gelo zilamtî çiya? Mirov çawe û bi çi rengî dikare tarîf bike? Ger bi rastî em îro ji zilamekî pirs bikin ku zilamtî çiya û çaweya? Wê pir zêde bersivekî di heqê wê de newe dayîn, ango tûyê nikaribî li bersivê bi awayekî rast fam bikî. Tê bibînî ku di bersiv dayinê de zihiniyetekî paşferû yê girêdaî zilamê serdest e, wê derkeve holê. Lê ji zanistiya ku tevgera PKK'ê daye me dixwazin xwe bigihînin wateya rast a vê babetê. Bê guman mirov dikare diyar bike ku her kesekî di nava tevgera azadiya PKK'ê de cihê xwe digire, li hemberî vê mijarê tekoşînekî bê aman tê dayîn, ku ji zihinyeta damezrîner a pênc hezar sal xwe rizgar bike û xwe bigihîne kesayeta pêşeng a mezlûman, zîlanan.

Eger bê gotin ku ( Mirov parçeyekî ji xwezayê ye û ji sedî sed bûyerên ku di xwezayê de jî rû didin, ev nayê wê wateyê ku me mesela pir nepixandiye. Yanî ravekirina me ya vê buyînê bi vî awayî ye: Eger mirov parçeyek ji xwezaya mezin be ku Rêber APO mirov wekî "Gerdûna piçûk " pênase dike hemû geşedan, guhertin, pevçûn û ber bi manedanê ve diçe, ev li gel mirov jî xwedî heman xisleta ango aramanca mirov ya di vê gerdûnê de ew e, ku fam bike û mane li jiyanê bar bike. Lê di roja îro de tê dîtin guhertina herî mezin di mirovan de çêbuye, bi tenê li ser yek bingihî ye, ew jî tinekirina xweza û herwîrdora xwe ye. Yanî dikare bê gotin ku di xwezayê de hevdû temamkirin, ango perdeya şermê heya, lê ev perde di mirov de gelek kêm û xedare.) û heya kujer e jî. Ji lewra pêwîst e em bi çavê zindîbûnê li gerdûn û xwezayê binêrin, eger wisa be manedayîna me gelek bi hêz dibe.

**Ev mijar wê bidom e.**



# Dorpêçkirina Şehbayê sûcekî li dijî mirovahiyê ye

Hikumeta Şamê bi armanca şikandina vîna gelê Efrînê yê li Şehbayê, dorpêçekê giran li ser herêma Şehbayê feriz dike û nahêlê ku sotemenî, derman û pêdiviyên jiyanê derbasî herêmê bibe. Di encama dorpêçê de tevahiya kar û xebatên tenduristî, perwerde û xizmetguzariyê hatin rawestandin û rê li ber karîseteke mirovî vebû. Tevî zehmetiyan jî gel li bibiryardariyeke mezin li ber xwe dide û di riya têkoşînê de gavan bi paş ve navêje.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Piştî dagirkirina Efrîn ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve 18 ê Adara 2019'an de, gelê Efrînê derbasî herêma Şehbayê bû. Rêveberiya Xweser li vê deverê xwe bi rêxistin kir û ji bo gel dest bi xizmetê kir. Her wiha hemû sazî û tevger hatin avakirin û di asta herî jor de alîkariya gel hate kirin. Ji wê demê û pê ve siyaseta dorpêç û êrişan li ser herêma Şehbayê hat destpêkirin. Li aliyekê êrîşên dagirkeriya Tirk li ser herêmê hatin domandin, li aliyê din jî hikumeta Şamê dest bi dorpêçê kir û hîn jî ev dorpêç dewam dike. Siyasetên li hemberî herêma Şehbayê tên meşandin hemû bi yek armancê ne, armanca wan jî di asta yekemên de têkbirina sîstema Rêveberiya Xweser re, herwiha têkbirina vîna gel û dagirkirina herêmê ye. Lê belê ev yek negihîşt tu encaman. Rûxmî hemû zehmetî û êrîşan jî gelê berxwedêr bi girêdana xwe ya bi xeta şoreşê re, hemû pilanên dagirkeriyê têk birin û bi têkoşîneke bêhempa li ber xwe didin.

Ji êrîşên dagirkeriya Tirkiyê zêdetir, di aliyê jiyanê de hikumeta Şamê bi dorpêçeke giran herêmê dixe hedefa xwe. Îsal careke din bi hatina demsala zivistanê re, dorpêça li ser herêmê girantir kir. Ev dorpêç dibe sedema têkçûna binasaziya herêmê. Ev dorpêç di asta yekemîn de bandora xwe li ser aliyê tenduristî û nexweşxaneyan dike. Li gorî agahiyên ku me ji Desteya Tenduristî û ji Rêvebriya Nexweşxaneya Avrîn wergirtine rewşa tenduristiyê gihîştiye asteke metirsîdar.

**Ji ber dorpêçê beşa tenduristiyê hatiye sekinandin**

Desteya Tenduristiyê li herêma Şehbayê bi temamî ji kar û xebatê hatiye rawestandin. Ji ber ku madeya mazotê madeyekî esasî ya hemû tevgerên jiyanê ye. Di encama tunebûna sotemeniyê de beş û xebatê tenduristiyê mecbûr dimîne were sekinandin. Desteya Tenduristiyê aliyekî esasî ya peydakirin û destekdayîna nexweşxaneyê ye. Weke ku hatiye diyarkirin ji ber tunebûna mazotê û kêm derfetan nexweşxane bi awayekî qismî hatiye sekinandin. Herwiha ambolansên nexweşxaniyê jî hatine rawestandin. Deboyên tenduristiyê tev endaman hatine sekinandin. Her wiha ya herî girîng peydakirina oksîceynê ji bo nexweşxaneyê ye, lê belê oksîceyîn derbasî herêmê nabe û ev yek rê li ber karîseteke mirovî vedike.

**Tunebûna oksîceynê li herêmê rê li ber karîseteke mirovî vedike**

Bi taybet di demsala zivistanê de nexweşiyên ku di encama sermayê de tên rudan gelekin. Gelê di kampan de rastî astengiyên mezin tên. Zarokên biçûk hewcedariya wan bi Rezaz û Oksîceynê heye. Ger ev yek di dema wê de neyê peydakirin wê rê li ber kerasetên mezin were vekirin. Hikumeta Şamê bi vê dorpêçê hemû pîvanên mirovî bin pêdike û dibe sûcdar.

**Nexweşxaneya Avrîn ji xizmetê hatiye derketin**

Di giştî herêmê de tenê Nexweşxaneya Avrîn heye. Ji bo tavahî gel dibe destek û cihê alîkariyê. Rêveberiya Nexweşxaneya Avrîn da xuyakirin ku nexweşxane bi awayekî qismî hatiye sekinandin. Ji 25 ê mehê ve hatiye sekinandin û ji derveyê rewşên ambolansê û zayîna xwezayî kesekî pêşwazî nakin. Ev yek jî ji ber heman sedemên tunebûna sotemeniyê ye. Endamên nexweşxaneyê ji 200 endamî, tenê 50 endam dewam dikin. Herwiha hat diyarkirin ku beşa ameliyatê



bi temamî hat girtin, pêşnêrêna nexweşan bi hemû beşên xwe hatin girtin, beşa lênêrîna giran hatiye sekinandin, bi giştî rewşa nexweşxaneyê û qada tenduristiyê di rewşeke aloz de ye.

**Nepeydakirina derman li herêmê**

Dorpêça hikumeta Şamê dijî pîvanên mirovahiyê. Di aliyê derbaskirina derman û pêwîstiyên nexweşxaneyê de her tim dibû asteng û zehemetiyê derbaskirinê derdixistin holê. Di van demên dawiyê de bi temamî derman li ser herêmê hatiye qutkirin, dermangeha girêdayî nexweşxaneyê kêmbûna derman jiyan dike. Her wiha dermanên pêwîst ji bo nexweşxaneyê nîn in.

**Di encama dorpêçê de de dibistanên herêmê hatin betlane kirin**

Desteya perwerdê û hindekariyê li herêma Şehbayê bi giştînameyekê batlaneya dibistanan di encama dorpêçê de da ragihandin. Di encama dorpêç û tunebûna sotemeniyê de, dibistanên herêmê û peymangehên Şehîd Viyan Amara bi giştî hatin petlane kirin. Weke me berê jî xuya kiribû ku hikumeta Şamê di derbaskirina alavên xwendinê û pirtûkan de astengî derdixistin. Lê rûxmî wê jî ev yek hat derbas kirin û xwendekar derbasî salên xwendinê bûn. Bi dorpêça heyî RE zêdetirî 16 hezar xwendekar ji xwendinê mehrûm mane û heyanî ev dorpêç neyê şikandin wê dibistan neyên vekirin.

# Rojnews: PDK'ê ji bo xizmeta dagirkeriya Tirk dengê rastiyê dike hedef

**Navenda Nûçeyan/ Qamişlo**

**Ajansa nûçeyan Rojnews'ê diyar kir ku PDK'ê di berdewamiya xeta xiyanetê ya li dijî destkeftiyên gelê Kurd û ji bo tarîkirina rastiyê edîtorên ajansê Silêman Ehmed revand. Herwiha da zanîn ku ew ê li ser şopa heqîqetê gavan bi paş ve neavêjin û rastiyê di tariyê de nehêlin.**

Ajnasa Rojnews'ê derbarê revandina edîtorê wê Silêman Ehmed ji aliyê PDK'ê ve, ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Rojnamevan û edîtdorê ajansa me Silêman Ehmed, piştî mirina bavê xwe beriya demekê bi armanca sardana malbata xwe bike, cara yekem di deriyê Sêmalka re derbasî bakur û rojhilatê Sûriya bû. Piştî bidawîbûn serdana Silêman careke din berê xwe da Başûrê Kurdistanê da ku karê xwe bidomîne, lê piştî derbaskirina wî deriyê Sêmalkayê , hêzên Partiya Demokrat a Kurdistanê ew revandin û ji wê demê ve tu agahî jê nehatine girtin. Çend roj piştî windabûan Silêman, Hêzên Asayîşa Dihokê ku girêdayî PDK'ê bi daxuyaniyekê ji rastiyê dûr û tijî derew diyar kir ku Silêman ji aliyê



wan ve hatiye girtin. Ji bo zelalkirina çarenûsa Silêman Ehmed em neçar man ku bi saziyên ku bi mafên rojnamevanan re têkildarin peywendiyê bikin."

Rojnews'ê da xuyakirin ku girtin û revandina rojnemevanan ji aliyê PDK'ê v rûreşiya wê dide xuyakirin û wiha domand: "Me ji bîr nekiriya û nayê jibîrkirin ku çawa rojnemevanên me li ser destê hêza Partiya Demokrata Kurdistanê hatine revandin û girtin, hîn jî birînên rojnemevanên Behdînan yên ku berê girtîbûn sax nebûne, heta niha jî dosiyayên wan di dadgehan de belavbûyî ne û bê çare ne. PDK'ê bi armanca bêdengkirina dengê azad, berdewamiya xiyanet û dijminatiya gelê kurd, Silêman Ehmed revand, ji vê alî ve em ê kiryarên wan yên ku xizmeta dijminên kurdan dikin û ji dagirkeriya Tirk re dibe alîkar, herwiha binpêkirinên wan ji raya giştî herdem eşkere bikin. Di vê çarçoveyê de me wek Ajansa Roj News ji bo eşkerekirina rastiyan ji gelê me yê Kurd û raya giştî re, gelek qurbanî dane, me hemû planên dijminên gel eşkere kir û em tekez dikin ku em ê li ser vê riyê berdewam bin. Vê riyê bişopînin û tu carî teslîmî desthilatdariya tu hikûmet, partî û aliyên siyasî nabin. Em tekez dikin ku em kuştina rojnamegerê me yê leheng û têkoşerê azadiyê, li navçeya Bahdînan şehîd Wadat Hisên ku li ser destê hêzên Partiya Demokrata Kurdistanê hat kuştin, ji bîr nakin. Ev zêdetirî 7 sal in ku bi ser doza wî re derbas bûye, û hîn jî kujer nehatine girtin. Lê bi alîkariya herkesê ku bi me û bi doza azadiyê re ne wê ev doz vekirî bimîne û em tu carî hêviya xwe ji dest nadin, û emê lêkolînê bikin heta ku sûcdar bên li dadgeheke adil û bêalî wrein cezakirin."

Ajnasa Rojnews'ê wiha dewam kir: "Partiya Demokrat a Kurdistanê, saziyên wê fermî û yên veşartî, piştî eşkerekirina hin rastiyên ku li dijî gelê kurd tê plankirin û xiyaneta ku li Dihok û Hewlêrê tê kirin, hîn jî gefa kuştin û girtinê li nûçegihan û endamên ajansa me dixwe. Bi dewleta Tirk a dagirker re li dijî çalakger û rojnamegeran e kiryaran dike. Me ji destpêkê ve bang li hikûmet, rayedar, aliyên peywendîdar û saziyên ku xwedî statuya "parastina mafên rojnamegeran" dikin, ku edîtorê ajansa me Silêman Ehmed serbest berdin. Me dosya Silêman ji raya giştî re eşkere kir û ev pêngaveke berdewam e, ji bo eşkerekirina rastiyên ku li dijî gelê Kurd, rojnamevan û dengên azad pêk tên, herwiha gelek peyam û daxuyanî ji rojnamevan, siyasetmedar û parlamenterên Kurdistanê jî gihîştine me. Em tekez dikin ku em ê hewil bidin dengê xwe û doza Silêman bigihînin Yekîtiya Ewropayê û ev dosya ji bo vekirina dosyayek li dijî PDK'ê piştî wê were veguhestin dadgehê. Piştî ku qanûn binpê kir û rojnamevanek bê destûrek demkî ya ragihandinê revandin, ji bilî rêgirtin li hevdîtina parêzer bi Silêman re û wergirtina dosyaya wî, heya niha çarenivîsa wî ne diyar e."

Ajansa Nûçeyan Rojnews'ê di dawiyê de wiha got: "Aliyên ku ji bo azadiya edîtorê ajansa me Silêman Ehmed piştgiriya xwe ji me re ragehandine wiha ne; (Ragihandina bê Sînor, Pênûsa Kurdî, Rêxistina Tîmên Aşitiyê yên Rapirsiyê (CPT) li Herêma Kurdistanê, Rînos, Navenda Metro, Sendîkaya Rojnamevanên Iraqê, Sendîkaya Rojnamegerên Herêma Kurdistanê, Yekîtiya Ragihandina Azad a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Rêxistina Parastina Rojnamegeran (CPJ) û hin parlamenterên Iraqê)."

# PKK'ê bi damezrandina xwe bû mizgîniya azadiyê

Salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê pêvajoya afirandine berxwedan û serkeftina mezin e. Di vî warî de PKK moral e, exlaq e û têkoşîneke mezin e. Raştiya PKK'ê raştiya gelan û mirovahiyê ye. Heqîqeta PKK'ê jî heqîqeta jina azad e.

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

Piştî şerê cîhamê yê yekemîn û duymîn, hêzên desthilatdar ji bo berjewendiyên xwe gelê Kurd kirin qurban, li her çar perçeyên Kurdistanê bêdengî û xewnek giran hebû. Herwiha gelê kurd bêhêviyek mezin jiyan dikirin. Tîşta ku hatibû serê wan weke qedera xwe qebûl kiribûn.

Li Bakurê Kurdistanê û Tirkiye jî bi giştî qeyrana aborî, siyasî û civakî dihat jiyankirin. Bi giştî tirkiye û bakurê Kurdistanê ber bi kaosekî ve diçû. Di hema demê de li cîhanê pêşketina şoreşê berfireh dibûn. Bi giştî dû blokan li hemberî hev sekinibûn. Ya yekem faşizim bû û gihiştî bû zirveya xwe. Ya duyem jî ji sosyalîzim weke hêviyekî ji bo mirovahiyê di sedsala 20'an de şoreşên mezin da pêşxistîn. Ev rewş bandora xwe li Tirkiyeyê jî kiribû.

Rêber Apo li ser van rewşane pir difikirî û jî zarokatiya xwe ve ku ji gund derdike ve nakokêyên di milê ziman, çand û bê bawerî jiyan dike. Di Newroza 1973'an de bi grubekî şeş kesî ku piranî xwendekar bûn. Li kêleka sedê çubuk ya Enqerê, bi gotina "Kurdistan bindest e" destpêdike. Biştre Rêber Apo dest bigera li Kurdistanê dike. Navçeyên weke: Dersim, Agirî, Bingol, Riha, Muş, Entap û Batman'ê serdan dike. Civinan çê dike û gelek kesayetan dibîn e

Di 1977'an li Entab'ê bi destê "sterka sor" heval Hakî Karer şehîd dikeve. Li ser bingeha bûyina bersiv ji vê şahadetê re, di 27'ê mijdara 1978'an de PKK 'ê tê ilan kirin. Di vê pêvajoyê de gelek partiyên çepger ên Kurd û tirkên ku weke sosyalist xwe di dan naskirin jî cewhera xwe derketin, berê xwe dane Ewropa û bi wî şêwazî hatin bê bandorkirin. Heta li hemberî PKK'ê ji hatin bi kar anîn. Lê PKK'ê weke yekane partiye ku xwe li ser lingan girt di saya Rêber Apo de, berê xwe da Filistin û ji rojhilatanavîn derneketin. Ji Rojhilata navîn dernektîn ji tê wateya dest ji ax û gelê xwe bernedane. Ev jî xwe dispêre zanabûna kur a dirokî, ideolojî û felsefeya Rêber Apo.

Bivî şewazî her çû PKK'e mezin bû û bû hêviya gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn. Dihat femkirin ku dijminê fasîşt tenê bi zimanê siyasî xwe li çareserkirina pirsgirêka Kurd nade, tû çarî nasname, îrade, bîr û baweriya gelê Kurd nas nekiriye. Ji bo wê yekê jî êdî biryara vegera



welat û pêşxistina xebatên çekdarî çêbû. Ji ber zimanê dewlata Tirk a faşistî. PKK heya giştê ve astê bedelên pir giranbiha dan e.

Di zindanan de û bi taybetî jî di zindana Amed de, bi pêşengatiya Şehîd Mazlum Doxan û Kemal Pîr berxwedaniyek bêhempa hat meşandin. Ew berxwedanî li hemû qadan piratîk bû û di nav gel de belav bû.

Ev 45 sale, PKK'ê roj bi roj, meh bi meh bi tekoşîna qehremanî, serkeftinên pir mezin bi dest xistine, di heman demê de wê bedelên pir giranbiha jî dane. PKK'ê jî tinebûnê hebû daye afirandin, îro di her çar parçeyên Kurdistanê de û li tevahî cîhanê belav bûye.

Bi tekoşina 45 salan a PKK'ê, gelê Kurd astengiyê pir mezin derbaskirin û bi nasnama xwe ya Exlaqî û polîtik di cîhanê de bû pêşengê. Mînak ber çavan jî paradigmaya Rêber Apo ye. Ku li ser bingeha netewa demokratîk, ekolojîk û azadiya cinsî bûye minakek ji Rojhilata Navîn û tevahî Cîhanê re. Her wiha di rêya Rêber Apo û PKK ê de gelê Kurd heya astekê gihiştîne azadiya xwe. PKK li hemberî taritiya hemû dewletên kaptalîzim û zihniyata sermayedaran bû çiruska azadiyê.

Di dema niha de jî berxwedaniya PKK'ê ya bêhempa, tênê bi rih û îradeye fedayî ya Apoyî, û bi zanebûn û baweriya Gerîlayan ya bi felsefeya Rêber Apo û girêdanbûna bi şehidan re bi hêviya azadiya gel û welat misoger bûye.

## Salvegera PKK'ê ya 45'an bersiva mezin bû!



**Dilyar Cizîrî**

Gelê kurd û dostên wan bi coş û heyecaneke mezin pêşwaziya salvegera 45'an a damezirandina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê kir. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahî Kurdistan û cîhanê coş û heyecan şahiyan balkêş û bi coş bû. Gel li her derê bi xurtî dilsoziya xwe ya bi Rêber APO û şehîdên azadiyê re nîşan dan û soza xwe ya serxistina şoreşê dubare kirin. Jin û ciwanan xemil û xêzên xwe bi tekoşîna demdirêj a PKK'ê û pêşengên wê re kirin yek.

Di coş û heyecana gel de mezinahiya PKK'ê û peradîgma Rêber APO bi stêrka gelawêjê derkete holê. Di qadan de keziyên serkeftin û azadiyê zindî bû. Serfiraziya felsefeya Apoyî di qîr û awirên çavên dayîk û ciwanan de diçirisand.

Tişta coş hîn zêde mezin kir, pêşwaziya gerîlayên azadiyê ya vê rojê bû, şervanên azadiyê ku demek dirêje di tunelên şer de li dijî hemû teknîka NATO'yê û çekên kîmyawî liber xwe didin, bi çalakiya Şehîd Leyla Sorxwîn salvegera damezrandina partiyê pêşwazî kirin.

Di çalakiyê de 18 dagirker hatin kuştin û wiha ev çalakî bû yek ji derbên giran ku di dilê sîstema qirker û faşizma AKP/MHP'ê hate xistin. Ev jî di xeta serxistina rihê tekoşîn û serfiraziyê de pêk hatiye. Gel li deşt û bajaran, gerîla li çiya bi yek rihî bi hev re gurzê xwe li nava dagirkeran dan. Bi hev re bûn hêza tekane riya têkçûyîna sîstema qirker, bûn hêmanên bingehîn ên serxistina riya azadî û çareseriya civakî.

Ew riya di Imralî re derbas dibe, li cem damezrînerê PKK'ê û xwediyê bîrdoziya Netewa Demokratîk Abdulah Ocalan re kom dibe. Ji ber wê jî niha ji her demê zêdetir pêwîste tekoşîna ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber APO feriz bû ye. Li ser wî esasî gereke her kes bi rihê berxwedan û heyecana di şahiyên salvegera damezrandina PKK'ê de hatin jiyankirin, beşdarî kampaniya azadiya fîzîkî ji Rêber APO û çareseriya demokratîk ji doza kurd re bibin. Kampaniya li 74 welatan destpê kir û belavî zêdeyî 105 welatan bû ye. Dostên kurdan li çar aliyên cîhanê çalakiyên bi bndor di çarçoveya hemeleyê de lidar dixin. Ew jî di salvegera damezrandina PKK'ê û beriya wê jî di tekoşîna jinan a ji bo 25'ê Mijdarê mezin bibû.

Di rastityê de Rêber APO, gel û gêrîla kompoloya navnetewî şikandine û ji wateya wê derxistine. Niha jî dem hatiye ku ev bi azadiya fîzîkî ya Rêbertî tacîdar bibe. Bi azadiya Rêbertî jî wê riya çareseriyê di tevahî herêmê de geş bibe. Ji ber êdî sebra civakan li ber sûc û binpêkirinên desthildaran nemaye.

Kawis û pirsgirêkên di tevahî herêmê de wê li ser esasê têkçûna kompoloyê werin çareserkirin. Fermandar, gêrîla û hemû şervanên Rêber APO wê di sala 46'an a PKK'ê de bi berizkirina asta tekoşînê de encamên hîn mezintir bi dest bixin.

# Çima Mifteya Çareseriyê Li Îmraliyê ye?

**Erdogan Altan**

Her tim ev dahûrandina Rêber Apo ya ku ji parêzeran re gotibû "Derfet bê dayîn ez dikarim di nava çend hefteyan de hemû pirsgirêkan çareser bikim" meraq û coşek mezin daye min. Ji ber ku her gotineke Rêber Apo ji bo min û ez bawerim ji bo tevahiya gelê Kurd jî wisa gotinên binê wan ne vala ye. Jixwe Meşa Gemlikê ya 18'ê Mijdarê ku ji her derê Bakurê Kurdistan û Tirkiyê bi hezaran kes herikî navçeya Bursa ya Gemlikê îsbata vê yekî ye.

Di vê meşî de di her wêne, dîmenan de bê îstîsna dirûşmeya "Mifteya Çareseriyê li Îmraliyê ye" hat dîtin. Ev dirûşme cara yekemîne ku di sala 2005'an de ji aliyê Federasyona Komeleyên Piştevaniya Malbatên Girtiyan (TUHAD-FED) ve hatibû organîzekirin de bibûm şahid. Ez jî wek e nûçegihanek meşvanên Gemlikê yên ji herêma Serhadê ketibûn rê û min dişopand û bi wan re roportaj dikir. Tê bîra min Dayika Aştiyê ya bi navê Dayika Şîrîn dihat naskirin, wateya dirûşmeya "Mifteya Çareseriyê Li Îmraliyê" wiha tanî ziman: "Niha bêkarî, xizanî, qetilkirin, tacîz, tecawiz, îşkenceyên di nava kolan û girtîgehan, pirsgirêkên çandiniyê, çandê, çînatî û hwd ji ber çi ewqas zêde heye li welat? Sedema xwe hemû ev şer ê bi dehan salane didome ye. Em jî dibêjin yê van pirsgirêkan ango şerî dikare rawestîne an jî bi dawî bike Rêber Apo ye. Lewra rûxmê di bin tecrîdê de û di nava çar dîwaran de dîl hatiye girtin jî ne tenê ji bo pirsgirêka Kurd, dikare hemû pirsgirêkên di Rojhilata Navîn de çareser bike, projeyên wê, hêzekî wî ya wisa mezin heye û em pê bawerin."

Heta di 2020'an de endamê Pêşmergeyê Dêrîn mamê Brahîm Hesen a ku li Haci Umranê sewalên xwe diçêrand, ewî jî bal dikişand ser vê rastiya dirûşmeyê, hem çima pêwîst dike û hem jî ji ber me bi rayagiştî baş nedaye fêmkirin bi zimanekê tûj me rexne jî dikir. Mamê Brahîm wiha digot: "Ne me, ne we, ne rêxistinên Kurd, qedrê Serok Apo nizanin, Em wateyê nadin fikir û ramanên ku dişîne. Her kes dizane mifteya çareseriya hemû pirsgirêkan Serok Apo ye, lê hesaba dewlet û desthiladaran nayê. Niha dibe hûn bibêjin pirsgirêkên min a nikarim rehetî sewalên xwe biçêrînim, bêkariyê û hwd in, dê Rêber Apo çewa vê çareser bike? Ma encama vê pirsgirêka min a biçûk a neçêrandina sewalan ne şer û neyekbûna Kurd û Kurdistanê ye? Belê! Waye Ciwamêr (Rêber Apo) dibêje 'Çareseriya van hemû pirsgirêkan pir hêsan e, pêwîste dawî li şer bînin û bi aqilane xalên jiyana wekheviyê ya hemû welatiyan rêz bikin. Pêşniyarên min hene, eger yê we jî hebe werin bikin hevpar û di demek kin de çareser bikin.'

Yanî di 2005'an de Dayika Şîrîn a li Wanê û di 2020'an de Mamê Brahîm a li Haci Umranê, bi kurt û kurmancî dixwazin bibêjin ku sebeba qrîz û felaket ên civakan dikşîne nava xwe şer e û tekane kesê vê şerî karibe rawestîne jî Rêber Apo ye. Lewra qrîz encam e û şer jî sedem e. Eger Rêber Apo azad bibe ew dem şerê ku sedema bingehîn a qrîz û kaosê ye wê dawî bibe.

Lewra sedema hêj jî ku şer didome, ji ber helwesta xirabker a hin partiyên Kurd ku li hemberê yekîtiya netewa Kurd e. Ji ber gelê Kurd dibêje ku dema Rêber Apo azad bibe, dê hemû gelê Kurd ê çar parçeyên Kurdistanê bigihêne hev û dema ev hêza mezin gihişte hev jî dê Tirkiyeyê, Îranê, Iraqê û Sûriyeyê derxe derveyê şer; dema ev çar welat derkevin derveyê şer, wê hêzên emperyalîst ew derfeta sêyemîn şerê cîhanê di Rojhilata Navîn de winda bikin, dê nikaribin şer gur bikin. Dema ev pêkhat jî gelên li van çar welatan ku bi qrîza dijwar dihejin, ji encama xirabker a krîzê rizgar bibin, welatê wan bigihêje demokrasiyê, îstîqrar û aramiyê. Ji ber vê yekî berjewendiya civakên van welatan bi daxwaza azadiya Rêber Apo ve girêdayî ye.

Ji ber vê yekî ye gelê Kurd di her platformî de rastiya vê dirûşmeya "Mifteya Çareseriyê Li Îmraliyê ye" tînin ziman.



# Azadiya Rêber Apo, azadiya tevahî gelên azadîxwaz e

Ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka siyasî ya Gelê Kurd, di 10`ê Cotmehê de Kampaniyeke Cîhanî li Silovîna hat destpêkirin û li hemû welatên cîhanê deng veda. Hevserokê însiyatîfa parêzerên Sûriyê Mihemed Emîn Neîmî, diyar kir ku Rêber Apo vîn û hêviya tevahiya gelên azadixwaz yên cîhanê ye û got, hizir û felsefya Rêber Apo li tevahiya cîhanî belav bûye û bûye xwedî cihekî binirx.

**Ciwana Mûsa/Qamoişlo**

Ji bo azadiya Rêber Apo Kampaniya Cîhanî ya bi dirûşmeya "Azadiya Fîzîkî ji bo Rêber Ebdullah Ocelan, û çareserkirina polîtîkî ji pirsgirêka gelê kurd re" di 10'ê Cotmehê de hate destpêkirin. Li gorî vê yekê ev kampanî ji 74 navendên cîhanê dest pê kir û bi awayekî berfireh li tevahî cîhanê belav bû. Di kampaniyê de zanyar, mamosteyên zanîngehan, feylesûf, pirofîsor, partiyên siyasî û civaka sivîl ji tevahiya cîhanê beşdarbûn. Ev kampaniya xwedî taybetmendiyekê ye ku ne tenê girêdayî bi cihekî tenê ye.

Derbarê vê kampaniyê de Mihemed Emîn Neîmî hevserokê Însiyatîfa Parêzerên Sûriyê ji bo parestina Rêber Ebdullah Ocelan, bi awayekî berfireh ji rojnameya me re axivî.

### Kmpaniya azadiya Rêber Ebdullah Ocelan

Mihemed Emîn Neîmî Hevserokê Parêzerên Sûriyê diyar kir ku Ji 10'ê Cotmehê ve pêngavek li ser asta cîhanê ji dewleta Silovîna destpê kir, bi serpereştiya komîteyek ji zaniyar, mamosteyên zanîngehê, mamosteyên pispor di felsefa û sisyolojiyê de û yên perlemanter hat destpê kirin. Daxwiyanî û gava yekem ji bo vê pêngavê li ser tevahî asta cîhanê hat dayîn, bidiruşmeya "Azadiya Fîzîkî ji bo Rêber Ebdullah Ocelan û çareserkirina polîtîkî ji pirsgirêka gelê kurd re" ev cara yekeme ku çalekiyek wiha li ser asta cîhanî çê dibe. Ya herî girîng ku ev herdû diruşme û mijar bi hev ve girêdayî ne. Rewşa Rêber Ebdullah Ocelan û pirsgirêka kurdî, yek ji tiştên herî taybete li gor dîroka ku li ser gelê kurd re derbas bûyî. Ev pêngav pêre pêre li 74 welatan dest pê kir û roj bi roj di dema îro de ji zêdeyî 100 navendan berbelavbûye. Di demek nêzîk de wê kongireya sêyemîn ya Ciwanên Şoreşger li ser asta cîhanê li Ewropa wê were li darxistin. Berya wê jî bi demek nêzîk de 400 Ciwanên Şoreşger ji tevahî cîhanê kongirek li paytexta Ferensayê Parîsê li dar xistin, ku ew kongir 3'ê rojan berdewam kir.

### Bandora fikir û felsefeya Rêber Ebdullah Ocelan

Mihemed Emîn Neîmî berdewamî da axaftina xwe û got:" Çi rengê çalekiyên ku li ser asta cîhanê heyî ji destpêka vê pêngavê ve têne pêkanîn. Çalekî eger di riya ragihandin, axaftin, sinefiziyon, zûm, çapemenî, rojnameyên rojane û heta çalekiyên li qad û kolanan. Çi rengê çalekiyên ku heyî li ser asta cîhanê têne meşandin ji aliyê hemû kesê ku heyî, ne tenê gelê kurd ve tevlîbûn jêre tê çêkirin. Yek ji taybetmendiyên vê pêngavê ew e ku ne tenê girêdayê herêmekê yan dewletekê ye. Ji xwe sedema wê jî ji fikir, felsefe û ramanên Rêber Ebdulleh Ocelan ne ku berbelavî hemû cîhanê bûye û her kes ji bona xwe remanê Rêber Apo weke riya çareserî û xelasiyê dibîne. Ev fikir û felsefeya Rêber Ebdullah Ocelan bi giranî li zanîngeh û hemû welatên cîhanê tên xwendin, gelek kesên biyanî jî li pey vî fikrê azad berê xwe dane Rojava û tevlî kar bûne. Li tavhî cîhanê fikrekî weha paqij, berfireh û azad bi şêwayekî aktîf nehatiya bikaranîn, ji bilî ku li rojhilata navîn tê pêkanîn, wek biratiya gelan, wekhevî, demukrasî û mafên jinan ku bûye cihê hêvî û baweriyê, û ew silogana "Jin Jiyan Azadî" ku Rêber Ebdulah Ocelan kir wek piransîbekê û li tevahî cîhanê belav bû." Herwiha wekî tê xuyakirin jî çiruska wê li rojhilat bi Jîna Emînî re dest pê kir, û li tevahiya welatên cîhanê deng veda. Ev jî tê wê wateyê ku fikir û felsefeya Rêber Ebdullah Ocelan tê xuyakirin ku çiqas ev fikir û felsefe bandora xwe li tevahî cîhanê û mirovahiyê dike.


### Armanca kampaniyê pêkaîna azadiya Rêber Ebdullah Ocelan e

Mihemed Emîn Neîmî bal kişand li ser kar û xebatên xwe û got; Em jî wek parêzerên Bakur û Rojhilatê sûriyê, di 14'ê Sibata 2021'an de me bi daxwiyaniyekê li bajarê Qamişlo damezirandin axwe ragihand. Di daxuyaniyê de me parêzerên Rojava bi giştî xwe



weke parêzerên Rêber Ebdullah Ocelan ragihand û navê me bû Desteya Parestina Azadiya Rêber Ebdullah Ocelan. Di 20'ê Gulana 2023'an de di komxebateke piçûk de nûnerê 6 yekîtiyên me yên li ser asta Rojava civiyan û me navê xwe guhert, û kir Insyatîfa Parêzerên Sûriyê yên parastina Rêber Ebdullah Ocelan û kar û xebatên me bi berfireh û mezin bû. Di 14'ê Cotmehê de wek gava yekem ji wê pêngavê me li bajarê Qamişlo daxuyaniyek li ser asta cîhanê da, ew daxuyanî jî ji aliyê parêzeran ve hate xwendin, û hate xuyakirin ku Rojava ji bo azadiya Rêber Ebdullah Ocelan bi rengekî guncaw bi vê pêngavê re dikeve liv û tevgerê de. Herwiha em jî tevlî kar û xebata cîhanî bûn û ji wê demê ve heta roja me ya îro kar û xebatên me gihiştiye asteke pir bilind. Ji bo azadiya Rêber Ebdullah Ocelan Têkiliyên me bi gelek parêzer, mafnas û siyastmedarên gelek welatan re heye. Di ber vê çalekiyê re em amedekariyên xwe ji bo kongireyeke li ser asta Sûriyê giştî dikin, ew kongir jî kongireke mafnasî ye, girêdayî rewşa Rêber Ebdullah Ocelan û kar û xebatên ji bona azadiya Rêber Apo di dema pêşde werin meşandin.

## Hêza gel bandora xwe ya li Filistînê nîşan da



**Zekî Bedran**

Şerê di navbera Israîl û Hemasê de ev nêzî du mehan e didome. Israîlê helwestek pir hişk û lihevneker girt. Diyar kir ku armanca wî Hemasê ji Gazzê derxe, bi şêweyekî tesfiye bike. Dest ji vê armanca xwe bernedaye. Lê kar weke xwesteka Israîlê jî naçe. Her ku şer dirêj dike zextên li ser Israîlê jî zêde dibin. Ev zext ji dewletan nayên, hêza bingehîn a zextê çêdike gel e.

Hemasê di êrişa 7'ê Cotmehê de gelek mirov dîl girtibûn. Dixwest wan li hemberî Israîlê weke kozekî bikar bîne. Di sergûzeşên xwe yên berê de hesasiya Israîlê ya di vê mijarê de dizanî. Ji ber wê jî Israîlê di vê mijarê de gav paşde avêt û agirbesta 4 rojan erê kir. Ji bo çêbûna agirbestê çeka herî mezin a di destê Hemasê de mirovên dîl bûn. Israîlê li gel nedixwest jî di encama zexta ji derve û hindir ve ev bazar û agirbest pejirand.

Dewleta herî zêde digot ez piştgiriya Hemasê dikim Îran bû. Paşê jî Erdogan derket bazarê û piştgiriya Hemasê kir. Em hemû dizanin ku ne Îran ne jî Tirkiye ji bo Filistîniyan şer nakin. Leşkerên xwe naşînin. Hinek hêz li ser xwîna Filistîniyan siyasetê dikin. Bi salane ev wiha ye. Eger ne wisabûya heta niha wê pirsgirêka Filistînê çareser bibûya.

Îran parastina xwe ji derveyî sînorên xwe dike. Ji ber wê jî Yemenê, hêzên weke Hizbûllah, Heşd Şebî û Hemasê bikar tîne. Niha Erdogan jî heman tiştî dike. Ixwanî, bermayên DAIŞ û El- Nûsrayê li Sûriyê li herêmên dagir kiriye kom kiriye û piştgiriyê dide wan. Li hemberî Kurdan û hikumeta Şamê bikar tîne. Erdoganê faşîst jî dibêje, "eger em Sûriyê dagir nekin û xetên sînor nexin bin venêrîna xwe em nikarin Tirkiyê biparêzin. Dê şer were Riha û Dîlokê". Bi vî awayî gelê xwe dixapîne. Bi derewa li dijî terorê şer dike, rê dide ber raya giştî ya hindir û derve û hewl dide sûcên xwe veşêre. Erdogan her carê derdikeve û dibêje ji bo Filistînê aştî û edaletê dixwaze. Lê li ser Filistîna xwe, li hemberî Kurdan qirkirinê pêk tîne, dest ji êrişan bernade. Eger li kêleka bindestan e û li dijî niheqiyê ye, divê destpêkê dest ji kiryarên li hemberî Kurdan berde. Sed sale hebûna Kurdan, mafê perwerdeya zimanê Kurdan red dike. Erdogan hewl dide bi polîtîkayên qirkirinê li ser lingan bimîne, kesên weke Erdogan dê çawa bibin parêzvanên mafê gelê bindest ê Filistînê? Derdê herî mezin ê Erdogan ewe ku niha pirsgirêkên Tirkiyê nîqaş neke û rojeveke din ava bike. Û derdê wî yê herî esasî jî ewe ku raperîna mirovî ya gel, bertekên gel ên li dijî êrişên Israîlê ji bo berjewendiyên xwe bikar bîne.

Pêwîste gelê Ereb, Filistînî û Kurd bizanin ku dewletên wiha azadî û berjewendiyên gelan esas nagirin. Pêşekiyên wan serwerî û berjewendiyên wan in. Di oxira berjewendiyên xwe de dikarin her sûcî bikin, serî li her cûr demagojiyê bidin. Dikarin pir qala demokrasî û mafê mirovan bikin. Lê weke di pirsgirêkên Ukrayna, Kurd û Filistîniyan de tê dîtin, li pey hêz û serweriyê, berjewendiyên xwe dibezin, dikarin gel weke qurban bikar bînin. Dema li Ukraynayê şer derket, li Rûsyayê hinek xwepêşandanên li dijî şer pêk hatin. Gel got ku ew aştiyê dixwazin. Lê rêveberiya Pûtîn ev xwepêşandan tepisand. Got, NATO û DYE dixwaze Rûsyayê dorçêp û belav bikin, em li dijî polîtîkayên antî emperyalîst têdikoşin. Xwest bi vî awayî gel bixapîne. Cezayên li hember kesên beşdarî xwepêşandanan dibin zêde kir. Dewletên Ewropayê jî heman tişt kirin. Gelê Ewropayê herdu şerên cîhanî jiyane, hêzek mezin a tevgera aştiyê hebû. Ragihandina DYE û Ewropayê propogandayek mezin kirin û gotin, dîktatorên weke Rûsyayê êrişî welatên me dikin, em şerê demokrasiyê didin, axên xwe diparêzin û pêşiya xwepêşandanan girtin. Ji vê zêdetir welatên weke Elmanyayê ji bo xerckirinên leşkerî sed milyar Euro cuda kir. Li Elmanyayê li dijî vê jî bertekek nehat dayîn. Di rewşek asayî de gel li dijî van kiryarên milîtarîzekirinê derdikeve, hikumet nikarin biryarên wiha bidin ber çav.

Ev pêşketin di demek pir zû û kin de pêk hatin. Li gel vê jî gelên cîhanê ji bo Filistînê ketin tevgerê. DYE û Ewropayê xwepêşandanên piştgiriya Hemasê dikin qedexe kir. Lê nekarîn gelan rawestînin. Li Fransa û Îngiltereyê mitîngên mezin çêbûn. Li Israîlê jî aciziyên li hemberî Netenyahû bi awayek vekirî anîn ziman, bertek zêde bûn. Rêveberiya DYE yê jî ji ber zexta gel neçar ma agirbestê ji bo armancên mirovî biparêze. Rêveberiya Fransayê jî agirbest xwest. Ev guherînên di helwestan de bi bertekên gel re derketin holê. Hikumet di bin zextek mezin de man. Ji ber van pêşketinan em dikarin bêjin bila gelên bindest xwe bispêrin hêza xwe ya cewherî û li ber xwe bidin, ne ku pişta xwe bidin dewletan. Gelên Rojhilata Navîn divê li Sûriyê û welatên din yekîtî û tifaqên xwe pêş bixin û li dijî dagirkeran, emperyalîst û mêtîngeran rawestin. Qasî ku bikarin jî bi riya dîplomasî û ragihandinê dengê xwe bigihînin gelê cîhanê.

## Koma Apoçiyan



**Farûk Sakik**

Di salên 70'yî de li Tirkiyê û li Bakûrê Kurdistan gelek rêxistin û tevger hebûn. Ji van tevgeran yek jî Koma Apociyan bû. Ev kom li dora ramanên Abdullah Ocalan kom bûbûn. Ji bo vê yekê ew wek "koma Apocî"bi nav dikirin. Lê ev Koma Apocî ji tevgerên din cuda bû. Kesên di nav van tevgerên din de li aliyek şoreşgerî dikirin û li aliyek jî xwendina xwe didomandin. Piştî zanîngehê wê li aliyek bixebitiyan û li aliyek jî şoreşgerî bikirina.

Lê endamên Koma Apocî yan wisa nebûn. Xwendina zanîngehê bi dawî kirin û derbasî qadên şoreşgerî bûn. Hin kes hebûn heger mehek du meh bixwendana wê bibûna xwedî pîşeyek. Lê wan digot na, şoreşgerî karekî profesyonelî û fedekariyê ye. Û biryarek din, digotin li kampusên zanîngehan û li kolanên metrepolan ev têkoşîn nayê dayîn. Divê ku têkoşîna doza Kurdistan, li Kurdistanê were dayîn. Û di destpêka 1976'an de kom ji Enqerê berê xwe da welat.

Ew koma îdeolojîk a li Enqerê ava bûbû, xebatên xwe êdî li Kurdistanê dida meşandin. Li Kurdistanê komê şiklê xwe nû kir. Li bajar û bajarokên Kurdistanê bê ku li cihê xwe bisekinin tevger kirin.

Li ku derê mirovek hebûya, li ku derê civînek hebûya, li ku derê mirovekî ji tekoşînê re vekirî hebûya, li wî digeriyan û didîtin, têkîlî bi wî/wê re pêş dixistin, bandor lê dikirin û dixwestin wan tevlî komê bikin.

Pêşî kar û xebat, cihên ku girseya ciwanên xwendekar lê pir in hat meşandin. Bajarên nêzîkê sînorê Bakurê Kurdistan û Tirkiyê; Dîlok, Mereş, Dêrsim, û heta Serhedê bi cih bûn. Piştî wê jî derbasî Riha, Amed û Batmanê bûn.

Herî zêde li Dîlokê man. Hakî Karer jî payîza 1976'an çû Dîlokê û li gel wî Cemîl Bayik jî hebû.

Cemil Bayîk destpêka vê rêwîtiyê wisa vedibêje:"Ez û Hevalê Heqî sibehî zû li Dîlokê peya bûn. Bi perê dawî yên di berîka xwe de me şorbeyek xwar û em bezîn bazara karkeran. Karmendên ji bo karkeran dihatin, karkeran bi wan re bazarî dikir; lê, em ewqas neçar bûn ku derfetên em ji bo rojaneya xwe bazarê jî bikin tune bû û bi yê destpêkê re ji bo nîv rojê em çûn kar. Heya nîvro me bi tenekeyan beton kişand û bi wî awayî me dest bi xebata xwe ya Dîlokê kir"

Belê Apocî wiha bûn. Fedekariyek bi vî rengî di nav civakê de tevdigeriyan Cemîl Bayik bi xebata înşaetê ya nîvrojî perê bi dest xist, îroj Kurdistaneke azad avakirî. Em bawer in ku di jiyana xwe de ew roj roja wî ya perexebitandinê ya dawî bû jî.

Tu carî bi tîtilên xwe yên zanîngeha an jî kurê Axa-Began bûnê (wê demê gelek ciwanên dewlemend, dewlemendiya xwe terk kiribûn û tevlî Koma Apociyan bûbûn) tevnegeriyan. Ev karekter û çanda wan bû sedem ku civak êdî ji şoreşgeran bawerî bîne. Ev bawerî piştî 15'ê Tebaxa sala 1984'an de bi awayekî zelal derket pêş.

Dema gerîla vegeriya Kurdistan, gotin; aha ew kesên berî 12'ê Îlonê soza Kurdistaneke azad dabûn me wa hatin. Ji her deverên Kurdistanê, dihatin û tevlî nav refên vê Koma Apociyan di bûn.

Ew pereyê bi xebatên nîvrojî ku Cemîl Bayik û Hakî Karer bi dest xistibûn, hîn jî di qasa PKK'ê de ji bo Kurdistaneke azad tê xerckirin. Ew betona bi tenekeyan dikişandin, di hîmê avahiya Kurdistanê de tê bikaranîn.